

Husein Muhammed

RÊZIMANA INGLÎZÎ

Bi zimanê kurdî

ENGLISH GRAMMAR IN KURDISH

2013 – 2014

Naverok

PÊŞGOTIN	3
HOW TO READ KURDISH?	5
ALFABE Û DENGNASÎ	7
KONSONANT.....	8
VOKAL.....	10
NAVDÊR.....	12
PIRTIKÊN DIYARÎ Û NEDIYARIYÊ	12
PIRHEJMARÎ	13
XWEDÎTÎ.....	16
HEJMAR	17
Hejmarên rêzî	19
Parjimar	21
Hesabkirin.....	21
RENGDÊR.....	22
RENGDÊRÊN GIRING	23
RENG	26
BERHEVDAN.....	27
Pêşîn û paşîn.....	29
CÎNAV	30
Desteya kirde.....	30
Desteya berkarî.....	31
Desteya xwedîtiyê ya girêdayî	31
Desteya xwedîtiyê ya serbixwe.....	33
Cînavên refleksîv (xwegêr)	34
Cînavên hevî (resîprokal).....	34
CÎNAV Û HOKERÊN PIRSYARKÎ	36
CÎNAV Û HOKERÊN TÊKILIYÊ	38
HIN CÎNAV Û DIYARKERÊN DIN YÊN GIRING.....	39
Hin cînavên din jî.....	42
DAÇEK	43
LÊKER	45
DEMA NIHA	45

LÊKERÊN GIRING	46
Lêkera "to be" [tu bî] (bûn)	50
WEZÎFEYÊN LÊKERA "DO, DON'T"	52
Lêkerên alîkar yên raweyî.....	53
Neyîniya lêkerên alîkar yên raweyî	54
Lêkera "to have" [tu hev] (hebûn, xwedî bûn)	54
Dema borî ya sade	56
Hin lêkerên awarte di dema borî ya sade de	58
Dema borî ya dûdar	60
Hin lêkerên awarte di dema borî ya dûdar de	62
Dema borî ya dût	64
Dema niha ya berdest	64
Dema bêt ya berdest.....	65
PASÎV	66
DEM	67
SAL	67
DEMSAL	67
MEH.....	68
HEFTE	68
ŞEV Û ROJ	69
SAET	70
XWARINÊN ROJÊ	71

PÊŞGOTIN

Zimanê inglîzî roj bi roj zêdetir dibe zimanê serekî yê hemû dinyayê. Her gava ku du qisekerên zimanên cuda bèn ba hev, heke yek ji wan zimanê yê din nizane, bi ihtimaleka gelek mezin ew herdu dê bi alikariya zimanê inglîzî danûstandinê bikin.

Kurd jî ji her demê zêdetir niha hewceyî hînbûn û zanîna zimanê inglîzî ne. Lê mixabin heta niha ti kitêbek li ser rêzimana inglîzî bi kurmancî peyda nabe. Ya rasttir, niha rêzimana ti zimanekê din – ji bilî zimanê kurdî bi xwe – bi kurmancî ne berdest e.

Kurd heta niha neçar bûn ku bi rêya zimanekê dagirker (erebî, farisî yan tirkî) dest bi hînbûna inglîzî bikin. Tesîreka nebaş ya van zimanan li ser fêrbûna inglîzî jî li kurdan dibe: kurd baş hîn inglîzî nabin ji ber ku di erebî û tirkî de gelek ji dengên inglîzî nînin. Di inglîzî de dengên hevberî "ç, ê, ç, g, j, o, p, v" yên kurdî hene lê ew di erebî de nînin. Di tirkî de jî "ê, w" û li dawîya peyvan jî "b, c, d, g" nînin ku di inglîzî de peyda dibe. Lê ev deng û û teqriben dengên din jî yên inglîzî di kurdî de hene û dengkirina peyvên kurdî li gor dengnasiya kurdî hêsantir e. Wek din jî rêzimana inglîzî ji erebî û tirkî zêdetir dişibe ya kurdî. Kurdî û inglîzî ji eynî binemala zimanan anku ji zimanên hindûewropî ne lê erebî û tirkî ne ji wê binemalê ne.

Ev kitêb bingegehên rêzimana inglîzî bi kurdiya kurmancî dide nasîn. Ji ber ku ev yekem rêzimana inglîzî ya bi kurmancî ye, ew bo hînberên destpêker hatiye nivîsîn: ne hewce ye ku mirov bo xwandin û feydekirina ji vê kitêbê berî niha ti inglîzî bizane. Lê ev pirtûk hewl dide ku hemû qeyd û bendên bingegehî yên rêzimana inglîzî pêşkêşî xwandevanên xwe bike. Loma kesên ku ji berê ve hinekê inglîzî dizanin jî dikarin jê mifadar bibin.

Kitêb ne tenê bi kurmancî hatiye nivîsîn lê ew bi taybetî jî li gor hewcedariya kurdîaxivan hatiye amadekirin. Inglîzî ne zimanekê fonetîk e anku her herf herdem ne wek hev tê xwandin. Loma awayê xwandina peyvan jî li ber wan li gor alfabeya kurdî hatiye diyarkirin daku kurdîzan bikarin wan peyvan rast bixwînin. Bo nimûne, peyva inglîzî ya bi maneya "rast" ya kurdî wek "right" tê nivîsîn lê wek "rayt" tê gotin. Loma di nimûneyan de ew wiha hatiye diyarkirin: "right [rayt]: rast" ku ji çepê ve ya yekem awayê nivîsîna peyvê ye, ya duyem şêweyê gotina wê ye û ya sêyem jî wateya wê peyvê ye.

Gelek caran awayê gotina peyvan bi alfabeya fonetîk ya navneteweyî IPA tê nivîsîn. Lê di vê rêzimannameya destpêkî de me bi zanetî li cihê IPAYê alfabeya kurdî bo diyarkirina awayê xwandina peyvên inglîzî bijartîye. Sebebê vê ew e ku piraniya kurdên destpêkerên zimanê inglîzî IPAYê yan qet nas nakin yan jî xwandina wê li ber wan giran û asê ye. Heke mirov bixwaze, dikare awayê gotina peyvên inglîzî bi IPAYê di gelek ferheng û rêzimannameyên din yên inglîzî de bibîne.

Ev rêziman bi taybetî bo kurdîxwînan hatiye hazirkirin daku ew hîni inglîzî bibin. Lê di rêzimannameya me de gelek nimûne hene ku bi inglîzî û kurdî ne. Inglîzîaxiv jî dikarin sûdê ji wan

wergirin û bi wan nimûneyan piçekê fêrî kurmancî bibin. Bo hêsankirina xwandina peyvên kurdî bo inglîzîzîmanan, awayê xwandina herfên kurdî bo inglîzîzîmanan bi listeya li jêr hatiye diyarkirin.

Me herwiha peyvên rêzimanî bi inglîzî jî dane. Hêvî heye ku piştî hînbûn bingehên rêzimana inglîzî, xwandevean dê bikarin bi alîkariya wan peyvên rêzimanî li ser wan babetan di nav kitêb û berhemên rêzimanî yên inglîzî de jî li gor pêwîstiyên xwe li wan mijaran bigerin û peyda bikin.

Demek kurt piştî vê rêzimannameyê, ferhengeka inglîzî-kurdî ya bi 1000 peyvên herî zêde li kar yên inglîzî li gel wergerên wan yên kurdî tê bêt belavkirin. Li gel her serpeyvê (headword) dê bi kêmî yek hevoka nimûne jî hebe.

Husein Muhammed

Helsinki, zivistan 2013/2014

HOW TO READ KURDISH?

This book introduces the basics of English grammar in the Kurdish language (Northern or Kurmanji dialect). The main target audience is Kurds who wish to learn English.

However, the book includes plenty of examples in both English and Kurdish. Therefore, they might be of at least some help for English-speakers who want to learn Kurdish.

Kurdish alphabet is quite phonetical: words are pronounced pretty much the way they are written, apart from some exceptions; there is a one-to-one correspondence between a letter and a sound. For instance, "a" is always pronounced in a similar way (as English "a" in "father"), contrary to English (e.g. in words like "bath, father, tame"...)

To better help English-speakers to read correctly Kurdish words and phrases included in this grammar, we provide a list on how Kurdish letters are pronounced. The pronunciation is slightly simplified.

Ç, K, P and T are typically unaspirated. Word-initially they are sometimes aspirated, especially in loanwords.

Kurdish alphabet	Like English...
A a	A in "father"
B b	B in "big"
C c	J in "John"
Ç ç	CH in "CHurch" (aspirated) or CH in "chur CH " (unaspirated)
D d	D in "dry"
E e	A in "hat"
Ê ê	EA in "head"
F f	F in "far"
G g	G in "game"
H	H in "have"
I i	I in "big"
Î î	EE in "see"
J j	S in "treasure" or French J in "jour"
K k	K in "key" (aspirated) or "sky" (unaspirated)
L l	L in "less"

M m	M in "make"
N n	N in "nap"
O o	O in "boring"
P p	P in "Paper" (aspirated) or P in "paPer" (unaspirated)
Q q	K in "can" but further back in the throat, Arabic ق
R r	R in "right" (word- initially more trilled/ rolled)
S s	S in "sea"
Ş ş	SH in "sharp"
T t	T as "take" (aspirated) or "star" (unaspirated)
U u	U in "put"
Û û	OO in "food"
V v	V in "very"
W w	W in "wait"
X x	CH in Scotch "loch" or German "acht"
Y y	Y in "yes"
Z z	Z in "zero"

ALFABE Û DENGNASÎ

Hemû herfên inglîzî di kurdî de jî hene lê di inglîzî de herfên kurdî yên bikumik (ê, î, û) û yên bipêncik (ç, ş) nînin¹. Lê helbet hemû herfên inglîzî û kurdî wek hev nayên xwandin.

Herf	Navê herfê	Dengê(n) herfê
A a	ey	e, ey, a, o
B b	bî	b
C c	sî	k, s
D d	dî	d
E e	î	ê, î
F f	êf	f
G g	cî	g, c
H h	êç	h
I i	ay	i, ay
J j	cey	c
K k	key	k
L l	êl	l, l̄
M m	êm	m
N n	ên	n
O o	ow	o, ow
P p	pî	pî
Q q	kyû	k
R r	ar	r
S s	ês	s, z
T t	tî	t
U u	yû	u, yu, ä
V v	vî	v
W w	dabîl̄-yû	w
X x	êks	ks, s
Y y	way	w
Z z	zî, zêd	z

Rêzimana inglîzî bi awayekê giştî gelek sade ye. Lê mijara ji hemûyan zehmettir nakokiya di navbera herfan û dangan de ye: eynî her di peyvên cuda de dikare bi awayên ji hev cuda bê

¹ Di hin peyvên biyanî de (bi taybetî yên ji frensî) carinan hin herfên din jî tên bikaranîn ku di bingehê alfabeya inglîzî de nînin, bo nimûne "é" di peyva "café" (qehwexane) de.

xwandin û hin caran jî hin peyv mit/bêdeng in anku qet nayên xwandin (bo nimûne "e" li dawiya peyvê). Sebebekê vê neliheviyê ew e ku axiftina inglîzî di dîrokê de gelek guheriyê lê nivîsîna inglîzî zêdetir wek berê maye. Sebebekê din jî yê giring ew e ku inglîzî li deverên cuda yên cîhanê bi awayekê giştî wek hev tê nivîsîn lê bi awayên ji hev cuda tê axiftin.

Di rastiyê de ti qeyd û bendên mitleq nînin ku mirov bikare diyar bike ka filan herf çawa tê xwandin: mirov çend qeydan rêz bike jî, dîsa hin peyvên inglîzî dê hebin ku ne li gor wan qeydan in. Lê dîsa jî hin qeyd hene ku dikarin alîkariya xwandevanan bikin ku piraniya peyvên rast bixwînin. Loma gava em li jêr dinivîsin ku filan herf bi bêvan awayî tê xwandin, divê wisa neyê fehmkirin ku "herdem" wisa tê xwandin lê "bi piranî" wisa tê xwandin.

KONSONANT

Em ê pêşî ji konsonantan (herfên bêdeng, *consonants*) dest pê bikin ji ber ku dengê wan ji dengên vokalan (herfên bideng, *vowels*) kêmtir li gor peyvên diguherin.

Konsonantên inglîzî ev in: b, c, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, t, v, w, x, z. Y nîv-konsonant e: carinan konsonant e, carinan jî vokala e (li jêrtir binêre).

B, D, F, H, M, N, V, W, Z wek hevberên xwe yên kurdî tên xwandin:

- *big* [big]: *mezin*
- *dark* [dark]: *tarî*
- *far* [far]: *dûr*
- *horse* [hors]: *hesp*
- *member* [mëmbir]: *endam, uzû*
- *name* [neym]: *nav*
- *very* [vêrî]: *gelek, pirr, zehf*
- *way* [wey]: *rê*

J wek C-ya kurdî tê xwandin: *job* [cob] = *kar, kargeh*.

R wek kurdî tê xwandin lê nermtir e û li dawiya peyvê hema-hema mit/bêdeng e anku nayê gotin.

L wek L-ya kurdî ya zirav (wek di peyva "lêv") tê gotin: *lip* [lip]: *lêv*. Lê hin caran jî L wek L-ya qelew ya di peyvên "silav, welat" de tê bilêvkirin. Em ê di vê rêzimanê de dengê L-ya qelew bi herfa [ɫ] binivîsin: *apple* [epit]: *sêv*.

K, P, T wek hevberên xwe yên kurdî yên bihilm anku "req" tên xwandin. Wek di peyvên "kar, perde, tamam" de, ne wek di peyvên "kirin, pênc, te" de.

- *king* [king]: *paşa, melik, qral*

- *party [partî]: partî hizb; şahî, cejn*
- *tea [tî]: çay*

S wek S-ya kurdî tê gotin: *say [sey]: gotin*. Lê li nav û dawiya peyvê gelek caran wek Z tê bilêvkirin: *rise [rayz]: rabûn, bilind bûn, hilketin, hilkişîn*.

G bi piranî wek G-ya kurdî tê gotin lê carinan li berî E, I yan Y wek C-ya kurdî tê xwandin: *give [giv]: dan* lê *Germany [cêrminî]: Elmanya*.

C bi piranî wek K-ya kurdî tê gotin lê li berî "e" û "i" wek S-ya kurdî tê gotin: *can [ken]: karîn, şiyar* lê *cinema [sinëmä]: sînema*.

Q wek K-ya kurdî tê xwandin. Di transrîbsiyona nav û peyvên rojhilatî de ew li cihê Q-ya kurdî tê bikaranîn: Qur'an.

X wek KS tê xwandin. Li destpêka peyvê ew wek dengê S tê gotin.

Y li berî yan piştî vokalekê (a, e, i, o, u) wek Y-ya kurdî tê gotin. Eger ew bikeve piştî konsonantekê, ew wek "î" ya kurdî yan jî "ay" ya kurdî tê xwandin:

- *ready [rêdî]: hazir, amade*
- *by [bay]: bi*.

Gelek caran dengê bi cotekê herfan tê diyarkirin. Cotherfên gberbelav yê konsonantî ev in:

CH wek Ç-ya kurdî tê xwandin: *change [çeync]: guherîn yan guherandin*.

SH li gel hev wek Ş-ya kurdî tèn xwandin: *she [şî]: ew (jin)*

PH wek F tê xwandin: *philosophy [filosofî]: filosofî, felsefe*.

TH wek Z-ya "fis" ("zal" ya erebî) – bi alfabeya fonetîkî ya navneteweyî anku IPA [ð] – yan jî wek S-ya "fis" ("sa" ya erebî) – bi IPA [θ] – tê xwandin. Em jî dê wek IPAYê S-ya "fis" bi [θ] û Z-ya "fis" jî bi [ð] diyar bikin. Heke mirov nizane ka ew çawa tèn gotin, mirov dikare wan herdem wek T bixwîne:

- *they [ðey]: ew (pirhejmar)*
- *three [θrî]: sê*

Gava ku KN li destpêka peyvê bin, tenê N tê xwandin: *knife [nayf]: kêr*.

Heke WR li destpêka peyvê bin, tenê R tê bilêvkirin: *wrong [rong]: xelet*.

Dema ku WH li destpêka peyvê bin, carinan tenê W tê gotin (*what [wat]: çî*) û hin caran jî tenê H (*who [hû]: kî*).

GH li dawiya peyvê wek F tê xwandin (*enough* [înaf]: bes) lê carinan jî bêdeng e (*though* [dûw]: *tevî ku, digel ku*). Di transrîbsiyona (tîpguhêziya) nav û peyvên rojhilatî de ew li cihê "xeyn"ê anku Ğ-/Ẃ-yê tê nivîsîn (Baghdad, Afghanistan: Bexda, Efxanistan). -IGHT bi giştî wek "-ayt" tê gotin (*fight* [fayt]: *şerr; might* [mayt]: *dibe ku; right* [rayt]: *rast*). Lê awarte: "*eight* [êyt]: *heşt; weight* [wêyt]: *giranî, wezn*".

KH di transrîbsiyona (tîpguhêziya) nav û peyvên rojhilatî de li cihê X-ya kurdî tê bikaranîn: Khalid (Xalid).

VOKAL

Vokalên inglîzî ev in: a, e, i, o, u. Y jî carinan vokal e lê hin caran jî konsonant e.

Mixabin ti ji vokalên inglîzî herdem bi eynî dengî nayên gotin. Li jêr em ê hin qeydên gelek giştî diyar bikin. Ya baş ew e ku xwandevan dikarin di ferhengên bikêrhatî yê inglîzî de awayê gotina her peyvê li ber awayê wê yê nivîskî bibînin.

A bi piranî wek "e" ya kurdî tê xwandin: *man* [men]: *mêr, zelum*. Carinan jî wek "a" ya kurdî tê gotin: *father* [faðer]: *bab, bav*.

Heke piştî A-yê konsonantek hebe û piştî wê konsonantê jî "e" hebe, hingê "a" wek "ey" (*same* [seym]: *eynî, heman*) yan jî wek "ê" (*care* [kêr]: *xwemxwerî, sexbêrî*) tê gotin. "ai" bi piranî wek "ê" tê xwandin (*hair* [hêr]: *mû, pirç, porr*). "aw" wek "o" yan "ow" yê kurdî tê gotin: *saw* [so]: *dît*.

Li berî du L-yan (ll) "a" wek "o" tê bilêvkirin: *ball* [boł]: *gog, hol, top, tepk; small* [smoł]: *biçûk; mall* [moł]: *firoşgeh, bazar*.

E bi piranî wek "ê" ya kurdî lê kurttir tê gotin. Em ê di vê rêzimanê de ê-ya kurt wek "ë" binivîsin: *her* [hêr]: *wê*. Heke piştî E-yê konsonantek hebe û piştî wê konsonantê jî "e" hebe, hingê E-ya yekem bi piranî wek "î" ya kurdî dirêj tê gotin: *here* [hîr]: *vir, vê derê*. "ea" wek "ê" yan jî "î" yê kurdî tèn bilêvkirin: *hear* [hîr]: *bihîstin, guh lê bûn; bear* [bêr]: *hirç*. Du "e" li gel hev (ee) wek "î" ya kurdî tèn xwandin: *beer* [bîr]: *bîra*.

I bi piranî wek "î" ya kurdî yan jî piçekê dirêjtir (lê ji "î" ya kurdî kurttir) tê gotin: *big* [big]: *mezîn*. Heke ew tenê piçekê ji "l" ya kurdî dirêjtir be, em ê wê wek "l" binivîsin. Lê heke bi zelalî ji "l" ya kurdî dirêjtir lê ji "Î" ya kurdî kurttir be (wek "î" ya tirkî), em ê wê wek "î" (du nuqte li ser "i") binivîsin: (*twenty* [twênti]: *bîst*). Heke piştî I-yê konsonantek hebe û piştî wê konsonantê jî "e" hebe, hingê I wek "ay" ya kurdî tê xwandin: *time* [taym]: *dem, wext, çax, kat*. "l" wek peyveka serbixwe bi maneya "ez" jî wek "ay" tê bilêvkirin.

O li gor peyvan wek "o", "ow" yan "a" tê gotin: *so* [so]: *wisa*. Du O (oo) bi hev re bi piranî wek "u" yan jî "û" ya kurdî tèn gotin: *book* [buk]: *kitêb, pirtûk* lê *food* [fûd]: *zad, xwarin*.

U hin caran wek U-ya kurdî tê gotin: *put [put]: danîn, bi cih kirin*. Lê gelek caran wek "a" ya kurdî lê piçekê kurttir tê xwandin. Em ê vê a-ya kurt di vê rêzimanê de wek "ä" binivîsin: *but [bät]: lê, feqet, ema*. Heke du konsonant bikevin pey U, ew dengekê nêzîkî "i" ya kurdî digire: *hurt [hirt] = êşîn yan êşandin*.

Y li dû yek yan çend konsonantan wek "î" yan jî "ay" tê gotin: *merry [mêri]: bicoş, bikeyf, xweş* lê *by [bay]: bi*. Heke Y bikeve pêş yan paş vokalekê, ew wek Y-ya kurdî tê xwandin.

NAVDÊR

Navdêr (*nouns*) navên tiştan, deveran, kesan û bûyeran in: sêv, Kurdistan, Ehmed, muzîk, baran...

Navdêrên inglîzî jî wek yên kurdî hejmêrbar (*count nouns*) in yan jî nehejmêrbar (*uncount nouns*) in. Anku hin jê dikarin bên hejmartin (jimêrbar) û hin jî nayên hejmartin. Navdêrên hejmêrbar dikarin wek navdêrên kurdî yekhejmar yan jî pirrhejmar bin. Lê berevajî kurmancî, navdêrên inglîzî cinsê (zayenda) rêzimanî nîne. Herwiha navdêrên yekhejmar tenê formeka xwerû heye, ew nayên çemandin/tewandin. Bo nimûne hem "sêv" û hem jî "sêvê" bi inglîzî "apple" e.

PIRTIKÊN DIYARÎ Û NEDIYARIYÊ

Navdêrên nediyar yên hejmêrbar di kurdî de paşpirtika "-ek" yan "-yek" digirin: "kitêb-ek, rojname-yek". Bi maneya wê di inglîzî de pirtika nediyariyê ((*indefinite article*) "a" yan "an" li pêş navdêrê tê danîn û jê cuda tê nivîsîn: "a book" (*kitêbek*), "an apple" (*sêvek*).

"An" wek "en" tê xwandin, "a" bi piranî wek "e" tê gotin. Lê heke giranî li ser "a" be anku mirov bixwaze bibêje ku tiştêk bi tenê yek e û ne zêdetir in, hingê "a" wek "ey" tê gotin.

Heke navdêr bi dengekê konsonantî dest pê bike, hingê "a" tê bikaranîn: "a boy" (*kurek*). Lê heke navdêr bi dengekê vokalî dest pê bike, hingê "an" tê bikaranîn: "an eye" (*çavek*).

Ya giring ew e ku peyv bi dengekê konsonantî yan vokalî tê gotin, ne giring e ka ew bi konsonantekê yan bi vokalekê tê nivîsîn: carinan peyvek bi konsonantekê tê nivîsîn lê bi vokalekê tê gotin û carinan jî berevajî. Ya muhim awayê gotinê ye, ne awayê nivîsînê: "an hour" [*en awir*] ji ber ku "hour" wek [*awir*] tê gotin) û "a university" [*e yunivêrsitî*] ji ber ku "university" wek [*yunivêrsitî*] tê xwandin.

Ji bilî pirtikên nediyar, di inglîzî de herwiha pirtika diyar (*definite article*) "the" [*di yan di*] jî heye. Ew hevberî "-eke" ya soranî, "el-" ya erebî, "le, la, l'" yên frensî û "der, das, die" yên almanî ye. Ew hingê tê bikaranîn dema ku mexseda navdêrê filan tiştê diyar e: "the chair" ("ew kursî" yan "filan kursî", ne "çi kursiya hebe"). Pirtika diyar hem li gel navdêrên yekhejmar û hem jî yên pirhejmar li kar e:

- *Bring the chair, please! (Ka [vê/Wê filan] kursiyê bîne!)*
- *Take away the chairs, please! (Ka [van/wan filan] kursiyên bibe!)*

PIRHEJMARÎ

Di inglîzî de forma komî (pirhejmar) bi amî bi alîkariya herfa "s" ji forma kit (yekhejmar) tê çêkirin:

Kit	Gotin	Komî	Wate
friend	[frênd]	friends	heval
school	[skûl]	schools	xwandingeh
car	[kar]	cars	tirimpêl, erebe
hand	[hend]	hands	dest
pen	[pên]	pens	qelem, pênûs
computer	[kompyûtir]	computers	kompûter

Heke forma yekhejmar bi "-ss, -ch, -s, -sh, -x" û gelek caran bi "o" bi dawî bê, hingê pirhejmarî bi herfên "-es" tê çêkirin:

Kit	Gotin	Komî	Wate
class	[klæs/klas]	classes	pol, sef, sinif
watch	[woç]	watches	saet
wish	[wiş]	wishes	hêvî
bus	[bäs]	buses	otobûs
box	[boks]	boxes	qutî, sindoq
potato	[piteyto]	potatoes	petat, kartol

Gava ku forma yekhejmar bi konsonantekê + Y bi dawî dibe, hingê Y ji forma pirhejmar tê avêtin û li cihê wê "-ies" tê nivîsîn:

Kit	Gotin	Komî	Wate
lady	[leydî]	ladies	xanim, hurmet
country	[kantrî]	countries	welat
party	[partî]	parties	partî

Lê heke berî Y-ya dawîya peyvê vokalek hebe, hingê Y wek xwe dimîne û tenê S lê tê zêdekirin:

Kit	Gotin	Komî	Wate
boy	[boy]	boys	kur, kurik
days	[dey]	days	roj
play	[pley]	plays	lîstik, yarî; şano

Heke di forma yekhejmar, di kîteya dawiyê de F hebe, ew gelek caran di forma pirhejmar de dibe “-ves”.

Kit	Gotin	Komî	Wate
wife	[wayf]	wives [wayz]	jin (jina kesekî)
life	[layf]	lives [layvz]	jiyan, ruh
knife	[nayf]	knives [nayvz]	kêr
leaf	[lɪf]	leaves [lɪvz]	pelg, pel, belg, belçim

Ji aliyê dengnasî ve bi awayê giştî “s” ya pirhejmariyê wek “s” tê gotin. Lê heke ew li peyv vokalekê yan jî li dû dengên li gor alfabeya kurdî “b, d, g, v, ð (z-ya fis) bin, hingê “s” wek “z” tê gotin. Heke li pey “s, z, ş, j, ç, c” jî be, hingê wek “-iz” tê gotin.

Formên hin navdêran awarte ne (*irregular*):

Kit	Gotin	Komî	Wate
man	[men]	men [mèn]	mêr, zalam (mirovên nêr)
woman	[wumen]	women [wimin]	jin (mirovên mê)
child	[çayɫd]	children [çɪɫdrên]	zarok
foot	[fut]	feet [fit]	pê
tooth	[tûθ]	teeth [tîθ]	qelem, pênûs
person	[pɪrsin]	people [pîpiɫ]	kes, mirov
mouse	[mawz]	mice [meys]	mişk

Navdêrên awarte ne tenê yên li jor lîstekirî ne. Ev tenê hin nimûne ne.

Pirhejmarên hin peyvan jî wek yekhejmarên wan in:

Kit	Gotin	Komî	Wate
fish	[fiş]	fish	masî
sheep	[şîp]	sheep	pez
deer	[dîr]	deer	xezal

Berevajî kurmancî, di inglîzî de forma pirhejmar hingê jî tê bikaranîn dema ku di kurmancî ne navdêr lê lêker yan diyarkerek eşkere dike ku navdêr pirhejmar e:

- *Kurd_ bi kurdî diaxivîn.* Kurds speak Kurdish
- *Heval_ baş in:* Friends are good.
- *Wî gelek heval_ hene:* He has many friends."

XWEDÎTÎ

Xwedîti di inglîzî de bi zêdekirin apostrofeke (') û herfa "s" tê çêkirin:

- *a friend's house*: mala hevalekî
- *John's wife* (jina Johnî)
- *Rachel's husband* (mere Rachelê)
- *children's books* (kitêbên zarokan)

Heke "s" ji xwe wek nîşana pirhejmariyê li dawiya peyvê hebe, hingê tenê apostrof (') li dût wê tê zêdekirin, êdî S-yeka din lê zêde nabe:

- *dogs' tails* (kuriyên kûçikan, kilikên seyan)
- *books' pages* (rûpelên pirtûkan)
- *my father's job* (karê babê min)

Xwedîti herwiha dikare bi "the ... of the ..." jî bê diyarkirin

- *the pages of the book* (rûpelên kitêbê)
- *the first page of the book* (yekem rûpelê kitêbê)
- *the pages of the books* (rûpelên kitêban)
- *a picture of my father* (wêneyekê babê min, wêneyekê ku babê min tê de ye)

Hin çaran jî di kurdî de gotinek bi xwedîtiyê tê diyarkirin lê di inglîzî de bi du peyvên li pey hev. Hingê peyvrêziya inglîzî berî ya kurdî ye:

- *winter clothes* (cilên zivistanê – winter: zivistan; clothes: cil)
- *evening meal* (xwarina êvarê – evening: êvar; meal = xwarin, cem)

HEJMAR

Mirov dikare hejmarên (*numbers, numeral*) inglîzî li ser du beşan parve bike: hejmarên bingehîn (*cardinal numbers*) û hejmarên rêzî (*ordinal numbers*)

Ji hejmarên bingehîn baş diyar dibe ku kurdî û inglîzî xizmên hev in û herdu ji eynî binemala zimanên hindûewropî ne. Bi taybetî bala xwe bidin awayê gotina hejmarên 2, 3, 6, 9, 10.

Hejmarên bingehîn

Nivîsîn	Gotin	Wate
1 one	wän	yek
2 two	tû	du
3 three	êrî	sê
4 four	for	çar
5 five	fayv	pênc
6 six	siks	şeş
7 seven	sêvin	heft
8 eight	êyt	heşt
9 nine	nayn	neh
10 ten	tên	deh
11 eleven	îlêvin	yazde(h)
12 twelve	twêlv	duwazde(h)
13 thirteen	êirtîn	sêzde(h)
14 fourteen	fortîn	çarde(h)
15 fifteen	fiftîn	pazde(h)
16 sixteen	sikstîn	şazde(h)
17 seventeen	sêvintîn	hevde(h)
18 eighteen	êytîn	hejde(h)
19 nineteen	nayntîn	nozde(h)
20 twenty	twëntî	bîst
21 twenty-one	twëntî- wän	bîst-û-yek
22 twenty-two	twëntî- tû	bîst-û-du
23. twenty-three	twëntî- êrî	bîst-û-sê
...
30 thirty	êirtî	sî, sih

thirty-one	θirt-wän	ˈsî-û-yek
...
40 forty	fortî	çil
50 fifty	fiftî	pêncî
60 sixty	sikstî	şêst
70 seventy	sêvintî	heftê
80 eighty	eytî	heştê
90 ninety	nayntî	not, nod
100 one hundred	wän händrêd	sed
101 one hundred and one	wän händrêd end wän	sed-û-yek
121 one hundred and twenty-one		sed-û-bîst- û-yek
200 two hundred		dused
300 three hundred		sêsed
1 000 one thousand	wän θawzind	hezar
1 011 one thousand eleven		hezar-û-yazde
10 ⁶ one million	wän miłyin	milyon
10 ⁹ one billion	biłyin	milyar

Wek kurmancî jî, hejmarên bingehîn tên berî navdêra ku tê hejmartin. Lê berevajî kurmancî, navdêr hingê herdem (ji bilî heke 1 be) nîşana pirhejmariyê (-s, -es) digire:

- *book (kitêb) > two books (du kitêb)*
- *watch (saet, demjimêrk) > ten watches (deh saet)*

Di hejmartinê de mirov bi kurmancî bo 100, 1 000 û 1 000 000 dibêje "sed, hezar, milyon" lê bi inglîzî dibêje "one hundred, one thousand, one million" anku "yek sed, yek hezar, yek milyon" (bide ber "du sed, du hezar, du milyon"). Di nav hevokan de mirov herwiha dikare bibêje "a thousand" anku "hezarek".

Hem kurmancî û hem jî inglîzî ji bilî navdêran, herwiha dikarin hejmaran bi xwe jî bitewînin, bi taybetî hejmarên temam yên wek sed, hezar, milyon:

- *hundred of students [händrêd ov styudints]: bi sedan xwandekar*
- *thousands of visitors [θawzindz ov vizitirz]: bi hezaran serdanker / mêvan*

Li cihê "bi dehan" bi piranî "dozens of" [dazins] li kar e.

Hejmarên rêzî

Bi hejmarên rêzî mirov cihê kesekî yan tiştêkî di sirayê anku rêzên li pey hev de diyar dike. Di kurdî de mirov dikare hejmarên rêzî bi gelek awayan çêke:

- *yekem, duyem, sêyem...*
- *yekemîn, duyemîn, sêyemîn*
- *-a/-ê/-ên yekê, -a/-ê/-ên dudiwa[n], -a/-ê/-ên sisiya[n]* (kurmanciya navendî)
- *-a/-ê/-êt êkê, ya/yê/yêt duwê, ya/yê/yên siyê / sê'ê* (kurmanciya rojhilatî)

Li gel formên bi "-em" û "-emîn" navdêr dikare berî yan piştî hejmarê be:

- *yekem car, cara yekem*
- *yekemîn car, cara yekemîn*

Bi formên din re navdêr tenê dikare piştî hejmarê be

- *cara yekê, hevalê diduwa, welatîyên tebeqa sisiya*
- *cara êkê, hevalê duwê, welatîyêt tebeqa siyê / sê'ê*

Bi inglîzî hejmarên rêzî 1., 2. û 3. ev in:

Nivîsîn	Gotin	Wate
1 first	first	yekem
2 second	sêkind	duyem
3 third	θird	sêyem

Ji wan her sê hejmaran pê ve yên din bi paşpirtika "-th" [θ] tên çêkirin

Nivîsîn	Gotin	Wate
4 fourth	forθ	çarem
5 fifth	fifθ	pêncem
6 sixth	siksθ	şeşem
7 seventh	sêvinθ	heftem
8 eighth	êyθ	heştem
9 ninth	naynθ	nehem
10 tenth	tênθ	dehem
20 twentieth	twentiθ	bîstem

21 twenty-first	twënti-wän	bîst-û-yekem
22 twenty-second	twënti-tû	bîst-û-duyem
23. twenty-third	twënti-θrî	bîst-û-sêyem
24. twenty-fourth	twënti-forθ	bîst û çarem
...
30 thirtieth	θirtîθ	siyem, sihem
40 fortieth	fortîθ	çilem
50 fiftieth	fiftîθ	pênciyem
...
100 hundredth	händrêdθ	sedem

Hişyarî

- 1) Ji çarê pê ve paşpirtika "-th" bigire jî, di rastnivîsîn û gotina hin hejmaran de cudahî peyda dibe:
 - 5 five [fayv] > fifth [fifθ] (guherîna nivîsînê û gotinê)
 - 8 eight [êyt] > eighth [êyθ] (guherîna nivîsînê û gotinê)
 - 9 nine [nayn] > ninth [naynθ] (tenê guherîna nivîsînê)
- 2) Hejmarên 11 - 19 bê guherînan paşpirtika "-th" digirin:
 - *eleventh, twelveth, thirteenth...*
- 3) Heke hejmar bi "-y" bi dawî bèn (wek "*twenty, thirty...*") di rastnivîsînê de ew dibe "-ieth":
 - *twentieth, thirtieth.*

Parjimar

Mebest ji parjimar (*fractions*) hejmarên ne tamam in. Hin nimûne ji parjimarên ev in: "nîv anku $\frac{1}{2}$, çarêk/çarek anku $\frac{1}{4}$, sêyek anku $\frac{1}{3}$ (yek ji sê, parçeyek ji sê parçeyak), du ji pêncan anku $\frac{2}{5}$, 1 û nîv anku $1\frac{1}{2}$...

Di inglîzî de jî, wek kurdî, "nîv"ê û "çarêk"ê navên xwe yê taybet hene:

- half [helf]: nîv (pirhejmar: halves [helvz])
- quarter [kortir / kwortir]: çarêk, çarek

Wek dî parjimar bi formulaya "parjimar bi hejmara xwe ya bingehîn û hejmara tamam forma xwe ya rêzî + -s" (heke parjimar ne 1 be) tên çêkirin:

- one-third (1/3)
- two-thirds (2/3)
- three fourth (3/4)
- three-fifths (3/5)

Hesabkirin

Di hesabkirinê de peyvên bingehîn di inglîzî de ev in:

Nivîsîn û nîşan	Gotin	Wate
plus +	płäs	zêde, û
<i>One plus two equals three.</i> $1 + 2 = 3$	<i>Wän pläs tû ikwîtz θrî.</i>	<i>Yek û du dibin du.</i>
minus -	maynis	kêm
<i>Five minus one equals four.</i> $5 - 1 = 4$	<i>Fayv maynis wän ikwîtz for.</i>	<i>Pênc kêm yek dibe çar.</i>
times X	divayd	parve kirin, lêkve kirin
<i>Two times three equals six.</i>	<i>Tû taymz θrî ikwîtz siks.</i>	<i>Du caran sê dibe şeş.</i>
divided by /	divayd	parve kirin, lêkve kirin
<i>Six divided by three equals two.</i>	<i>Siks divaydid bay θrî ikwîtz tû.</i>	<i>Şeş li sêyan parvekirî dibin du.</i>

RENGDÊR

Rengdêr anku sifet (*adjectives*) ew peyv in ku diyar dikin ka kesek yan tiştêk çawa ye: baş, dirêj, giran, sor, sar, rengîn...

Di kurmancî de di komika peyvvan de rengdêr bi awayekê giştî bi izafeyan (paşpirtikan) bi navdêran ve tên girêdan: *mal-a xweş, reng-ê sor, dest-ên paqij, mal-ek-a mezin, dar-ek-ê stûr, kitêb-ên erzan*.

Anku di kurmancî de peyvrêziya di vê rewşê de wiha ye:

- 4) navdêr + (pirtika nediyariyê "-ek / -yek") + izafe (-a / -ê / -ên) + rengdêr (nimûne: "mal-ek-a mezin" yan li gor hin devokan "mal-ek-e mezin")

Di inglîzî de rengdêr yekser (dîrekt) tên berî navdêran. Heke pirtikên diyarkirinê yan hejmar yan cînav jî li gel hebin, peyrêzî wiha ye:

- 5) pirtik / hejmar / cînav + rengdêr + navdêr.

Ne di kurmancî de jî di inglîzî de rengdêr bi xwe li gor hejmarê yan cinsî natewin.

Cînav	Wate
good friends	(hin) hevalên baş
a good friend	hevalek baş
the good friend	hevala / hevalê baş
the good friends	(filan) hevalên baş
two good friends	du hevalên baş
no good friend(s)	ti hevalê(n) baş
every good friend	her hevala/ê baş

Rengdêr herwiha bi alîkariya lêkereka girêder çawaniya navdêran diyar dikin:

- 6) *This car is new. (Ev tirimpêl nû ye.)*
- 7) *That film seems interesting. (Ew film balkêş dixuye.)*

Di vê rewşê de peyrêziya kurmancî ye: (cînav / hejmar / hoker +) navdêr + rengdêr + lêker.

Di inglîzî de peyvrêzî wiha ye: (cînav / pirtik / hoker +) navdêr + lêker + rengdêr.

RENGDÊRÊN GIRING

Em ê li vê derê lîsteya giringtirîn rengdêrên inglîzî bi awayê wan yê nivîskî li gel şeweyê gotina wan û wateya wan bi kurdî pêşkêş bikin. Tenê wateyên bingehîn yên peyvê hatine dan loma hin wateyên din jî dikarin hebin ku di vê lîsteyê de nehatine diyarkirin.

Nivîsîn	Gotin	Wate
able	eybiş	bişyan, kara, yê ku dikare
afraid	efrêd	bitirs, tirsîyayî
alive	eşayv	zindî, sax, nemirî
awake	eweyk	hişyar (ne di xew de)
bad	bed	xirab
beautiful	biyûtifuş	spehî, delal, ciwan
big	big	mezin
bitter	bittir	tehl
brave	breyv	wêrek
broad	brod	fireh, berfireh
bright	brayt	geş
busy	bizî	mijûl, meşxul
careful	kêrfiş	xemxwer, bisexbêr
cheap	çîp	erzan
clean	klîn	paqij, pak
clear	klîr	zelal
clever	klêvir	jîr, bîaqil
close	kłowz	nêzîk
closed	kłowzd	girtî (ne vekirî)
colorful / colourful	kaşirful	rengîn
cloudy	kławdî	ewrîn, biewr
cold	kołd	sar
cool	kûl	hênîk; xweş
dangerous	deynciriz	bitehlîke, xeternak
dark	dark	tarî
deep	dîp	kûr
difficult	difikuşt	zehmet
dirty	dirtî	pîs
dry	dray	zuha, ziwa
dead	dêd	mirî

early	early	zû (berî dema xwe)
empty	emptî	vala, vale, xalî
exciting	ikzayting	biheyecan
expensive	ikspensiv	bihagiran, giran
fair	fêr	dadmend, adil
famous	feymis	navdar, binavûdeng, meşhûr
far	far	dûr
fast	fast	bilez, lezgîn
fat	fet	qelew
fine	fayn	(gelek) baş; hûr, hûrik
flat	flet	pehn
free	frî	azad, serbest; betal
fresh	frêş	hênik; taze, teze; terr
full	ful	tijî; têr
funny	fanî	pêkenok, (bo zewqê) xweş
generous	cêniris	merd
gentleman	cêntilmen	camêr, xweşmirov
glad	gîed	şa, keyxweş
good	gud	baş
great	greyt	hêja, (gelek) baş
happy	hepî	dilşa, dilxweş, kêfxweş
hard	hard	req; zehmet
healthy	hêlî	saxlem
high	hay	bilind
hot	hot	kel, (gelek) germ
hungry	hangrî	birsî, birçî
important	importint	giring, muhim
interesting	intiristing	balkêş, dilkêş, cazib
jealous	cêlis	çavnebar, hesûd
kind	kaynd	xweşmirov, camêr
large	larc	mezin; berfireh
late	leyt	dereng, direng
light	layt	sivik
little	litî	kêm, piçek
lucky	lakî	bişans, bextiyar
low	low	nizm
loud	lawd	(dengê) bilind
lucky	lakî	bişans, bextiyar
narrow	nerow	teng
near	nîr	nêzik
necessary	nêsisirî	pêdivî, pêwîst, zerûrî

new	nîw	nû
nice	nays	xweşmiro; xweş
noisy	noyzi	biqerebalix, dengbilind
old	old	kevn; pîr
open	owpin	vekirî, vebûyî
quiet	kwayit	bêdeng, bêqerebalix, tena, rehet, aram
quick	kwik	bilez, zû
polite	połayt	rêzgir, bi-ihtiram
poor	pûr	feqîr, jar, hejar
rich	riç	zengîn, dewlemend
sad	sed	xemgîn, melûl
safe	seyf	biewle, bêtehlîke
salty	sołty	sûr, şor, têrxwê
short	şort	kurt, kin
sick	sik	nesax, nexweş
slim	słim	narîn, nazenîn, zeîf, libar
slow	słow	hêdî
small	smoł	biçûk
soft	soft	nerm
sour	sawir	tirş
strong	strong	xurt, bihêz, qewî, qaîm
sweet	swît	şîrîn
tall	toł	(mirovên) dirêj; (avahiyên) bilind
thick	θik	stûr, qalind; tîr
thin	θin	tenik
thirsty	θirstî	tî, têhnî (hewceyî avê)
tiny	taynî	hûrik, pîrri biçûk
ugly	aglî	kirêt, kirh, necis
useful	yûzfuł	bikêrhatî
useless	yûzłis	bêkêr, bêxêr
warm	worm	germ
well	wêł	baş; sax, saxlem
wet	wêt	şil
weak	wîk	qels, lawaz, zeîf
windy	windî	biba, badar, têrba
whole	howł	temam, kamil, tev
worthless	wurθlës	bêqîmet, bêbiha, bêkêr
worthwhile	wurθwaył	bihagiran, bikêr, biqîmet
young	yang	genc, xort, ciwan

Gava ku mirov bixwaze bibêje tiştek û tiştekê di "hindî hev" yan "wek hev" in û wan bi rengdêrekê bide nasîn, em peyvika "as ... as" [ez ... ez] bi kar tînin:

- This is as good as that one. Ev wek ewa han baş e.

- *This is as good as that one. (Ev wek wê baş e.)*
- *Summer isn't as cold as winter. (Havîn ne wek zivistanê sar e.)*

RENG

Navên rengan (*colors / colours*) dikarin di kurdî û di inglîzî de jî hem wek rengdêr û hem jî wek navdêr bên bikaranîn. Navên rengan di lîsteyeka li jêrtir de hatine rêzkirin.

Nivîsîn	Gotin	Wate
black	blek	reş
blue	blû	şîn
brown	brawn	qehweyî
green	grîn	kesk
grey	grêy	gewr
orange	orinc	pirteqalî, narincî
pink	pink	pembeyî, pîvazî, pink
purple	pirpişt	mor, xemr
red	rêd	sor
white	wayt	spî
yellow	yêlow	zer

BERHEVDAN

Di inglîzî de, wek kurdî, mirov dikare taybetiyên tiştan bide ber hev: "mezintir, biçûktir, mezintirîn, biçûktirîn".

Forma berhevder (*comparative*) bi "-er" [-ir] yan "more ..." [mor] tê çêkirin. "More" dikeve pêş rengdêrên dirêj (sêkîteyî yan dirêjtir):

Sade	Berhevder
difficult zehmet	more difficult zehmettir
beautiful spehî	more beautiful spehitir
expensive (biha)giran	more expensive (biha)girantr

"-er" dikeve pey rengdêrên kurt (yek- yan dukîteyî):

Sade	Berhevder
slow hêdî	slower hêdîtir
soft nerm	softer nermtir
rich zengîn	richer zengîntir
high bilind	higher bilindtir
low nizm	lower nizmtir

Heke rengdêr bi xwe bi "-e" bi dawî bê, êdî tenê "r" lê tê zêdekirin: "large > larger" (berfireh), "nice > nicer" (xweşmirov, xweş).

Heke rengdêr bi "-y" bi dawî bê, di forma berhevder de "-ier" tê cihê wê: "tiny > tinier" (hûrik), "lucky > luckier" (bişans, bextiyar).

Formên berhevder yê peyvên "good" (baş), "bad" (xirab) û "little" (kêm, piçek, hindik) awarte/istisna ne:

Sade	Berhevder
good [gud] baş	better [bêtir] baştir, çêtir
bad xirab	worse [wirs] xirabtir
little [litl] kêm, piçek, hindik	less [lës] kêmtir, piçektir

Di hin peyvên kurt de konsonanta dawiya peyva sade di forma berhevder de dubare dibe:

Sade	Berhevder
big mezin	bigger mezintir
hot kel, germ	hotter germtir

Bo diyarkirina kut îstek "ji" tişteke din cuda ye û eşkerekirina wê bi rengdêrekê di inglîzî de bi alîkariya peyvika "than" [ðen] tê bikaranîn:

- *This is better than that one. (Ev ji wê baştir e.)*
- *Summer isn't colder than winter. (Havîn ne ji zivistanê sartir e.)*

Forma sûperlatîv (*superlative*) bi kurdî dikare bi sê awayên ji hev cuda bê bikaranîn

- **-tirîn**: firehtirîn, tengtirîn
- **herî + forma sade**: herî fireh, herî teng
- **ji hemûyan + forma berhevder**: ji hemûyan firehtir, ji hemûyan tengtir

Bi inglîzî forma sûperlatîv bi alîkariya paşpirtika "-est" (rengdêrên kurt) yan jî bi peyvika "most ..." (rengdêrên dirêj) tê çêkirin:

Sade	Berhevder	Sûperlatîv
hard req	harder reqtir	hardest reqtirîn
hot kel, germ	hotter keltir, germtir	hottest germtirîn
dangerous xeter	more dangerous xetertir	most dangerous xetertirîn

Hemû guherînên di forma berhevder de çêdibin, di forma sûperlatîv de jî cih digirin:

- dubarenebûna "e" ya li dawiyê: *nice > nicer > nicest*
- "y > "-iest": *lucky > luckier > luckiest*
- dubarebûna konsonantê: *big > bigger > biggest*

Formên sûperlatîv yê peyvên "good" (baş), "bad" (xirab) û "little" (kêm, piçek) jî awarte ne:

Sade	Berhevder	Sûperlatîv
good [gud] baş	better [bêtir] baştir, çêtir	best [bêst] baştirîn
bad [bed] xirab	worse [wirs] xirabtir	worst [wirst] xirabtirîn
little [litî] kêr, piçek, hindik	less [lêr] kêmtir, piçektir	least [lîst] kêmtirîn

Forma superlatîv di de bi alîkariya "ya / yê / yên" yên serbixwe yan jî "-a / -ê / -ên" yên bi navdêrê ve girêdayî tên xebitandin:

- *Ev ya/yê baştirîn e. Ew yên baştirîn in.*
- *Ev sêva baştirîn e. / Ev baştirîn sêv e.*

Di inglîzî de li cihê wan wê pirtika diyarker "the" yekser li pêş navdêrê cihê xwe digire:

- the best apple (*sêva baştirîn / baştirîn sêv*)
- This is the best. They are the best. (*Ev ya/yê baştirîn e. Ew yên baştirîn in.*)
- This apple is the best. (*Ev sêva baştirîn e. / Ev baştirîn sêv e.*)

Pêşîn û paşîn

Di kurdî de tiştê berî hemûyan li dawîya hemûyan bi gelek awayên tên gotin:

- yekem, ya/yê/yên yekê, ewil, pêşîn, ya/yê/yên pêşiyê
- dawîn, ya/yê/yên dawiyê, axir, ya/yê/yên axirî, axirîn, paşîn

Di inglîzî de yekem "first" [first] û "dawîn" jî "last" [last] yan "final" [fayni] e.

CÎNAV

Di kurmancî de du desteyên cînavan hene: desteya xwerû (ez, tu, ew, em, hûn, ew) û desteya çemandî (min, te, wê/wî, me, we, wan).

Tevî ku di inglîzî de tenê desteyeka navdêran heye (bo nimûne "book" li cihê "kitêb" û "kitêbê") lê di inglîzî de pênc desteyên cînavan hene.

Desteya kirde

Nimûne	Gotin	Wate
I	[ay]	ez
you	[yû]	tu
he	[hî]	ew (mêr û kit)
she	[şî]	ew (jin û yekhejmar)
it	[it]	ew (heywan yan tişt yê kit)
we	[wî]	em
you	[yû]	hûn
they	[ðey]	ew (komî: ferq nake mêr, jin, heywan yan tişt bin)

Ev deste wek kirdeyên hevokan tên bikaranîn anku di hevokan de ew tiştêkî dikin yan tiştêk yan kesek in:

- 8) *I say (ez dibêjim).*
- 9) *I said (min got).*
- 10) *You are here. (Tu li vê derê yî).*
- 11) *He went (Ew çû).*
- 12) *She ate (wê xwar).*

- a) Bala xwe bidinê ku di kurmancî de forma cînavî carinan diguhere (ez dibêjim / min got) lê di inglîzî de, heke cînav kirde be, ew herdem bi vê desteya xwerû tê bikaranîn (I say / I said).

- b) Di inglîzî de hevberî "tu" û "hûn" herduyan tenê "you" heye. Anku inglîzî wek ihtiramgirtinê tenê ji her kesî re dibêjin "hûn", ti caran nabêjin "tu". "Thou" (tu) ya dîrokî êdî di zimanê niha de nemaye.
- c) Hişyar bin ku di inglîzî de li cihê "ew" ya kurdî çar cînavên cuda hene.

Desteya berkarî

Cînav	Gotin	Wate
me	[mî]	min
you	[yû]	te
him	[him]	wî (kesî)
her	[hër]	wê (kesê)
it	[it]	wê/wî (heywanê/î yan tiştê/î)
us	[äs]	me
you	[yû]	we
them	[ðëm]	wan

Ev deste wek berkarên hevokan (*object*) û li gel daçekan (prepositions) tên bikaranîn anku di hevokan de ew tiştê li wan tê kirin yan di wan de ye yan ji wan dice yan tê wan yan bi wan tê kirin: *You see me (Tu min dibînî), You saw me. (Te ez dîtîm), for us (bo me, ji me re).*

- a) Bala xwe bidinê ku di kurmancî de forma cînavî carinan diguhere lê di inglîzî de, heke cînav berkar yan bi daçek be, ew herdem bi vê desteya berkarî tên bikaranîn.
- b) Di hevokên kurmancî peyvrêza normal kirde+lêker+berkar e (ez te dibînim) lê di inglîzî de kirde+berkar+lêker e ("I see you" ku peyv-bi-peyv dibe "ez dibînim te").

Desteya xwedîtiyê ya girêdayî

Cînav	Gotin	Wate
my	[may]	(-a /-ê /-ên) min
your	[yor]	(-a /-ê /-ên) te
his	[hiz]	(-a /-ê /-ên) wî (kesî)
her	[hër]	(-a /-ê /-ên) wê (kesê)

its	[its]	(-a /-ê /-ên) wê/wî (heywanê/i yan tiştê/i)
our	[awir]	(-a /-ê /-ên) me
your	[yor]	(-a /-ê /-ên) we
their	[ðer]	(-a /-ê /-ên) wan

Ev deste wek xwediyên / xudanên komika peyvên tê bikaranîn:

13) *my book* (*kitêba min*),

14) *your friend* (*hevalê te*)

15) *her eyes* (*çavên wê*)...

- Di peyvrêziyê de di kurmancî de tiştên xwedîkirî berî xwediyê xwe ye û bi izafeyê (-a / -ê /-ên) bi xwediyê xwe ve tê girêdan (*kitêb-a min*, *bira-y-ê wî*, *çav-ên wê*). Lê di inglîzî de xwedî berî tiştên xwedîkirî ye ("*my book*" ku peyv-bi-peyv dibe "*a-min pirtûk*", "*his brother*" dibe "*ê-wî bira*", "*her eyes*" dibe "*ên-wê çav*")
- Ev desteya cînavan tenê hingê bi kar tê dema ku yek yan zêdetir navdêrên xwedîkirî li dûv wan hebin: "*your head*" (*serê te*), "*my books and pens*" (*kitêb û qelemên min*). Heke mirov bixwaze cînavên xwedîtiyê bê tiştê xwedîkirî bi kar bîne, wek "ya min, yê min, yên min" (li cihê "kitêba min, dilê min, çavên min", hingê mirov di inglîzî de cînavên desteya xwedîtiyê ya serbixwe dixebitîne (li jêrtir binêre).
- Bala xwe bidinê ku di kurmancî de navdêr berî cînavê tê û navdêr bi izafeyê / qertafê (*kitêbA min*, *hevalÊ te*, *çavÊn*) bi cînava li pey xwe ve tên girêdan. Izafe di kurmancî de cînsê nêr yan mê yan jî pirhejmarî diyar dike. Di inglîzî de cînavê xwedî berî navdêra xwedîkirî tê û pirhejmarî – heke hebe – bi dawiya navdêrê ve girêdayî ye (*her eyeS*).
- Heke li gel navdêrê rengdêrek jî hebe, hingê rengdêr dikeve navbera cînavî û navdêrê: "*my new friend*" (*hevalê min yê nû*).

Desteya xwedîtiyê ya serbixwe

Cînav	Gotin	Wate
mine	[mayn]	(ya /yê /yên) min
yours	[yorz]	(ya /yê /yên) te
his	[hiz]	(ya /yê /yên) wî (kesî)
hers	[hërz]	(ya /yê /yên) wê (kesê)
its	[its]	(ya /yê /yên) wê/wî (heywanê/î yan tiştê/î)
ours	[awirz]	(ya /yê /yên) me
yours	[yorz]	(ya /yê /yên) we
theirs	[ðerz]	(ya /yê /yên) wan

Ev deste wek cînavên xwedîtiyê / xudaniyê tên bikaranîn gava ku ew serbixwe tên xebitandin anku tiştê xwedîkirî li dû wê nayê:

Desteya 3	Desteya 4
It is my book (Ew kitêba min e).	It is mine. (Ew ya min e).
This is her bag (Ev çanteyê wê ye.)	This is hers. (Ev yê wê ye.)
Are these your pens? (Gelo ev qelemên te ne?)	Are these yours? (Gelo ev yên te ne?)

Cînavên refleksiîv (xwegêr)

Cînav	Gotin	Wate
myself	[maysêlf]	(ez) xwe
yourself	[yorsêlf]	(tu) xwe
himself	[himsêlf]	(ew mêr) xwe
herself	[hêrsêlf]	(ew jin) xwe
itself	[itsêlf]	(ew heywan / tişt) xwe
ourselves	[awirsêlvz]	(em) xwe
yourselves	[yorsêlvz]	(hûn) xwe
themselves	[dömsêlvz]	(ew) xwe (komî: mirov, heywan yan tişt)

- Ev desteya cînavan wek berkara hevokê tê bikaranîn gava ku berkar û kirde eynî bin: *I see myself in the mirror.* (Ez xwe di eynikê re dibînim.)
- Ev deste wek berkara daçekan jî dikare bê bikaranîn: *She cooked food for herself.* (*Wê xwarin bo xwe çêkir.*)
- Wek kirdeyê hevokê dema ku mirov bixwaze bibêje kesekî "bi xwe" yan "bi tenê" tiştêk kiriye: *He did it himself.* (Wî bi xwe ew kir.)
- Hişyarî: berevajî kurdî, di inglîzî de ev deste nayê bikaranîn dema ku hin tiştên wisa tên kirin ku mirov adeten bi xwe dike: "*Wî xwe şûst.*" (*He washed himself.*) "*Wê cil li xwe kirin*" yan "*wê cil kirin ber xwe.*" (*She dressed herself.*)

Cînavên hevî (resîprokal)

Cînavên hevî anku resîprokal (*reciprocal*) di inglîzî de "each other" û "one another" in. Ew hemû maneya "hev, hevdu, hevudu, hevûdin, yekûdu, êkûdu" yên kurmancî didin. *We see each other every day.* (*Em her roj hev dibînin.*)

"Each other" bi forma xwe ya xwedîtiyê "each other's" jî heye: "*We are each other's friends.*" (*Em hevalên hev in.*)

Cînavên nîşander

Cînavên nîşander (*demonstrative pronouns*) bi kurmancî "ev" û "ew" in û formên wan yên çemandî / tewandî ne (vê/vî/van, wê/wî/wan). Di kurmancî de ew li gor cinsî /vê/vî, wê/wî), li gor hejmarê (yekhejmar "vê/vî" û "wê/wî" lê pirhejmar "van" û "wan") û herwiha li gor kirde û berkarê (kirde: "ev mal xweş e" lê berkar: "ez ê vê malê bikirim") diguherin.

Di inglîzî de cînavên nîşander li gor kirde û berkarê yan li gor cinsî naçemin lê li gor hejmarê tên tewandin.

Yekhejmar	Pirhejmar	Wate
this [ðis]	these [ðîz]	ev
that [ðät]	those [ðûz]	ew

- *This book is good. (Ev kitêb baş e.)*
- *These books are good. (Ev kitêb baş in.)*
- *That pen is sharp. (Ew qelem tûj e.)*
- *Those pens are sharp. (Ew qelem tûj in.)*
- *I read this newspaper. (Ez vê rojnameyê dixwînim.)*
- *I read those newspapers. (Ez van rojnameyan dixwînim.)*
- *I write with that pen. (Ez bi wî qelemî dinivîsim.)*
- *I write with those pens. (Ez bi wan qeleman dinivîsim.)*

"**This one**" maneya "eva han, evê han" dide gava ku li dûv wan ti navdêr di komikê de tine bin. "**That one**" jî wateya "ewa han, ewê han" dide. Pirhejmariyên wan jî wiha ne: "these ones" (evên han) û "**those ones**" (ewên han).

Heke rengdêrek raveker jî li gel navdêrê hebe, hingê rengdêr dikeve navbera cînavî û navdêrê:

- *this new car (ev tirimpêla nû)*
- *that old house (ew xaniyê kevn)*

Di kurmancî de cînavê nîşander û cînavê kesî dikarin bikevin pey hev_

- *Ev hevalê min*
- *Ev hevalê te yê nû*

Di inglîzî de cînavên nîşander û yên kesî nikarin bikevin dûv hev. Loma di rewşên wiha de mirov hewceyî avakirineka din ku gelek wek qalibê kurdî ye:

- *this friend of mine*
- *this good friend of yours*

Herwiha ev qalib hingê pêdivî ye gava ku mirov di eynî komikê (frazê) de cînavê xwedîtiyê û pirtikeka serbixwe ya diyariyê (the) yan nediyariyê (a, an) bi kar bîne:

- *a friend of mine (hevalekê min)*
- *a good friend of yours (hevalekê te yê baş)*

CÎNAV Û HOKERÊN PIRSYARKÎ

Cînavên pirsyarkî (*interrogative pronouns*) ew cînav in ku mirov pê pirsê tiştan yan kesan dike. Di kurmancî de "çi, çî" cînavê neçembar e anku herdem wek xwe dimîne. Lê, berevajî "çi", cînavê "kî" forma tewandî "kê" jî heye. Herwiha cînavê "kîjan" jî jê hatiye çêkirin.

Herçi hokerên pirsyarkî (*interrogative adverbs*) ne, mirov bi wan pirsê dem, cih, sebeb û çawanîya tiştan dipirse: "kengî, kû, çima, çawa". Ew di kurdî de nayên tewandin (ne *kengiyê, *çimayê...)

Di inglîzî de jî ji cînavên pirsyarkî "what" (çi) û "which" naçemin. Hemû hokerên pirsyarkî jî neçembar in: "how" (çawa), "when" (kengî), "where" (kû, kû derê).

Cînav	Wate
what [wät]	çi
who [hû]	kî; kê (wek kirde)
whom [hûm]	kê, kî (wek berkar û li gel daçekan)
whose [hûz]	(ya /yê /yên) kê
which [wiç]	kîjan, kîj, kîşk
where [wër]	kû, kû derê; li kû
when [wën]	kengî, kingê
why [way]	çima, bo çi, ji ber çi

- *What is this? (Ev çi ye?)*
- *What are you doing? (Tu çi dikî?)*
- *Who is he? (Ew kî ye?)*

- *Whom do you know? (Tu kê nas dikî?)*
- *Whose home is this? (Ev mala kê ye?)*
- *Which is yours? (Kîjan y ate ye?)*
- *Where do you go? (Tu kû ve diçî?)*
- *Where are they? (Ew li kû ne?)*
- *Where does he come from? (Ew ji kû tê?)*
- *When do you return? [ritin] (Tu ê kengî vegerî?)*
- *Why are you so sad? [sow sed] (Tu çima wisa xemgîn î?)*

Bala xwe bidinê ku:

- a) "Who" li gor berkariyê (whom) û di rewşa xwedîtiyê de (whose) ditewe.
- b) "Where" hem maneya "kû, kû ve" (livîna ber bi cihekî ve) û hem jî wateya "li kû, li kû derê, li kû ve" (mana li cihekî dide). Lê heke mirov bixwaze livîna "ji cihekî" diyar bike, daçeka "from" yan tê pêş "where" (from where) yan jî dikeve dawiya hevokê: *Where he comes from? (Ew ji kû tê?)*
- c) Di hevokên bi cînavên yan hokerên pirsyarî de cînavê/hokera pirsyarkî li destpêkê ye, forma tewandî ji lêkera "be" (am, is, are...) li dû wê ye û paşî jî kirdeyê tê: "What is this?" ("Ev çi ye?", peyv-bi-peyv: "Çi ye ev?") "Who is he?" ("Ew kî ye?", peyv-bi-peyv: "Kî ye ew?")
- d) Heke lêker ne formeka ji lêkera "be" be, hingê hevok bi lêkera alîkar "do" (li gel cînavê sêyem yê yekhejmar "does") tê avakirin: "What do you say?" ("Tu çi dibêjî?" ku peyv-bi-peyv dibe "Çi dikî tu gotin?")

CÎNAV Û HOKERÊN TÊKILIYÊ

Cînavên “**what**” û “**who**” (li gel “**whom, whose, which**”) herwiha wek cînavên têkiliyê (*relative pronouns*) jî tèn bikaranîn:

- *You can say what you want. (Tu dikarî bibêji [ka/bê] te çi divê.)*
- *I know who you are. (Ez dizanim [ka/bê] tu kî yî.)*
- *I forgot whom I saw? (Min ji bîr kir [ka / bê] min kî dît.)*
- *This is my friend who studies biology. [bayolocî] (Ev ew hevalê min e yê ku biyolojîyê dixwîne.)*
- *That bag is the one whose owner I don't know. (Ewê han ew çante ye yê ku ez xwediyê wî nanasim /nizanim.)*

Ji bilî “**what, who, whom, whose, which**”, “**that**” [dê] jî wek cînavê pirsyarkî tèn bikaranîn û wateya “**ku**” ya kurmancî dide:

- *I didn't know that you are here. (Min nedizani ku tu li vir î.)*

HIN CÎNAV Û DIYARKERÊN DIN YÊN GIRING

Ev cînav yan diyarker di inglîzî de naçemin anku herdem bi eynî formê ne: bo nimûne “a little” hem maneya “piçek” û hem jî wateya “piçekê, piçekî” dide.

Em ê li jêr van diyarker (determiners) û cînavan (pronouns) bi nimûneyan pêşkêş bikin.

Cînav	Gotin
a few [e fîw]	hin, hinek, hindek, çendek, çend (ne wek pirsiyar)
<i>I know a few persons here.</i>	<i>Ez çend kesan li vir dinasim.</i>
a little [e lit]	piçek, hindik, kêr, hinek
<i>He speaks a little English.</i>	<i>Ew piçekê inglîzî dizane.</i>
any [eni]	her, kîjan be
<i>Bring any books you have.</i>	<i>her kitêba ku te hebe bîne.</i>
anyone [eni wan]	her kes, kî jî be
<i>Anyone can do this.</i>	<i>Her kes dikare vê bike.</i>
anything [eniθing]	her tişt, çi tişt be jî, ti tişt
<i>Is there anything I can do for you?</i>	<i>Gelo tişteke heye ku ez bo te bikim?</i>
a number of [e nâmbir ov]	hejmareka, hejmareke, hinek, çendek

<i>A number of people were killed.</i>	<i>Hejmareka mirovan hatin kuştin.</i>
a couple of [e kapił ov]	cotek, du-sê
<i>A couple of friends visited me.</i>	<i>Du-sê heval hatin serdana min.</i>
all [oł]	hemû, hemî, giş, gişt, tev
<i>All the students came to the class.</i>	<i>Hemû xwandekar hatin dersê.</i>
almost [ołmost]	teqriben, hema-hema
<i>Almost all were happy with the results.</i>	<i>Teqriben hemû bi encaman razî bûn.</i>
another [inäðir]	ya/yê din, ya/yê dî
<i>Try another time.</i>	<i>Careka din biceribîne.</i>
any [eni]	her, kîjan be
<i>Bring anything you what.</i>	<i>Her tiştê ku bixwazî bîne.</i>
both [bowθ]	herdu
<i>We are both writers.</i>	<i>Em herdu nivîskar in.</i>
certain [sirtin]	filan, diyar, yek yan hin kes yan tiş tên diyar
<i>Certain things must be changed.</i>	<i>Hint îşt hene ku divê bête guherandin.</i>
each [îç]	her yek, her kes
<i>Each of us will have to answer the questions..</i>	<i>Divê ku her yek ji me bersiva pirsan bide.</i>
either ... or [îðir ... or]	yan ... yan jî
<i>Either you will do it or we will not pay you.</i>	<i>Yan tu ê wê</i>

		<i>bikî yan jî em pare nadin te.</i>
enough	[inäf]	têr, bes, têra
<i>Are you courageous enough to do it?</i>		<i>Tu têra xwe wêrek î ku wê bikî?</i>
every	[evri]	her, her kesy an tişt
<i>Every person in the room was sitting.</i>		<i>Her kesê di odeyê ve rûniştî bû.</i>
few	[fiw]	kêm, kêm kes yan tişt (yên ku dikarin bên hejmartin)
<i>There are few people who understand this story.</i>		<i>Kêm kes hene ku vê çîrokê fehm dikin.</i>
fewer	[fiwir]	kêmtir (kes yan tist_)
<i>Fewer women wear scarves nowadays.</i>		<i>Vî zemanî kêmtir jin serpoşan li serê xwe dikin.</i>
how many	[haw meni]	çend, çiqas (tiştên ku dikarin bên hejmartin)
<i>How many cigarettes do you smoke per day.</i>		<i>Tu di rojê de çend cigareyan dikêşî?</i>
how much	[haw mäç]	çend, çiqas (tiştên ku nayên hejmartin)
<i>How much milk can you drink?</i>		<i>Tu dikarî çiqas şîrî vexwî?</i>
least	[list]	kêmtirîn, piçektirîn
<i>Among his friends, he earns the least.</i>		<i>Di nav hevalên wî de, meaşê wî kêmtirîn e.</i>
little	[lit]	kêm, piçek (tiştên ku nayên hejmartin)
<i>There is little water left.</i>		<i>Kêm av maye.</i>
many	[meni]	gelek, pirr (kesy an tiştên ku dikarin bên hejmartin)
<i>Many people don't know that.</i>		<i>Gelek kes wê nizanin / ji wê bêhay in.</i>
more	[mor]	zêdetir, pirrtir, gelectir (forma

		berhevder ji "many" yan "much")
<i>I want more soup.</i>		<i>Ez zêdetir şorbeyê dixwazim.</i>
much	[mäç]	gelek, pirr, zêde (tiştên ku nayên hejmartin)
<i>He doesn't like meat much.</i>		<i>Ew pirr ji goştî hez nake.</i>
none	[nan]	ti kes, ne ti kes
<i>None was there.</i>		<i>Ti kes (ji wan) ne li wê derê bû.</i>
nothing	[naθing]	ti tişt
<i>I bought nothing.</i>		<i>Min ti tişt nekirrî.</i>
neither	[nîðir]	ne ti ji herdutan
Neither came.	[nîðir ... nor]	Ti ji herduyan nehatin
neither ... nor	[nîðir ... nor]	ne ... û ne jî
<i>Neither here nor there.</i>		<i>Ne li vir û ne jî li wir</i>
one	[wän]	kes, mirov
<i>One can say so.</i>		<i>Mirov dikare wisa bibêje.</i>

Hin cînavên din jî

- some [sam]: hin, hinek, hindek, çendek
- someone [sam-wan], somebody [sam-badî]: kesek
- something [samθing]: tişteke; hin tişt
- anyone [enîwan], anybody [enîbadî]: her kes, çi kes be
- one [wan], you [yû]: mirov²
- others [aðirz]: xelk, yên din, alem

² Ji bilî maneyên wan yên bingehîn: "one: yek" û "you: tu".

DAÇEK

Daçek (*prepositions*) cih, jêder û armanca tiştan diyar dikin. Daçekên serekî yên inglîzî ev in:

- **from** [from] ji
 - o He is from America *Ew ji Amerîkayê ye*
- **in** di ... de; li
 - o in a book *di kitêbekê de*
 - o in Europe *li Ewropayê*
- **on** [on] li ser
 - o on the table *li ser maseyê / mêzeyê*
- **to** -ê, -î (livîna heta cihekî yan ber bi cihekî ve diyar dike)
 - o go to town *çûn bajarî*
- **at** [et] li, li ber
 - o at home
- **for** [for] bo, ji bo, ji ... re, jê re
 - o only for you *tenê bo te, tenê ji te re*
- **with** [wið] li gel, bi ... re, pê re
 - o Come with us! *Li gel me were! Bi me re were!*
- **with** [wið-awt] bê (ne "pê re", ne "li gel")
 - o She wend without us *Ew bêyî me çû*
- **behind** [bihaynd] li pişt, pişt
 - o The tree is behind the house *Dar li pişt xanî ye*
- **in front of** [in front ov] li pêş
 - o The car is parked in front of the house *Tirimpêl li pêş xanî hatiye parkkirin*
- **after** [eftir, aftir] piştî, li pey, li dû
 - o for you *tenê bo te, tenê ji te re*
- **before** [bîfor] berî
 - o He arrived here before us *Ew berî me gihîşt vir*
- **above** [ebav, ebov] (li) raserî, (li) hindavî; zêdetir ji, di ser re
 - o above his head *li raserî serê wî*
- **below** [for] li bin, binî
 - o The temperature is below zero degrees *Pileyê germahiyê li bin sifrê ye*
- **under** [andir] li bin, bin, di bin ve
 - o under the sofa *li bin qenepeyê / sofayê*
- **ahead** [ehêd] li pêş (berî, jê pêşketîtir)
 - o He is ahead of his friends *Ew li pêş hevalên xwe ye*
- **around** [erand] li dor
 - o to travel around the world *li dor dinyayê gerîn*
- **between** [bitwîn] di navbera ... de
 - o between you and I *di navbera min û te de*

- **down** [dawn] jêr, xwarê, binî
 - o Come down! *Were xwarê!*
- **up** [ap] jor, serî
 - o Get up! *Rabe ser xwe!*
- **since** [sins] ji (dema) ... ve, ji (filan demê) heta niha
 - o Since 1980 *Ji sala 1980ê ve*
- **during** [dyûring] dema
 - o During the last five years *Di van pênc salên dawiyê de*
- **out** [awt] derê, derve
 - o Get out! *Derkeve, here derê!*
- **via** [vaya] di ... re
 - o We traveled via Istanbul *Em di Stembolê re çûn*
- **towards** [tiwardz] ber bi ... ve
 - o She came towards us *Ew ber bi me ve hat*

LÊKER

DEMA NIHA

Çemandina / tewandina lêkeran di inglîzî de di dema niha de gelek hêsan e. Li gel cînavên "I, you, we, you, they" lêker wek xwe dimînin. Bo nimûne, em ê du lêkeran ("see [sî]: dîtîn" û "go [gow]: çûn") bidin:

- *I see: ez dibînim*
- *You see: tu dibînî*
- *We see: em dibînin*
- *You see: hûn dibînin*
- *They see: ew dibînin*

- *I go: ez diçim*
- *You go: tu diçî*
- *We go: em diçin*
- *You go: hûn diçin*
- *They go: ew diçin.*

Tenê li gel cînavên sêyem yên yekhejmar (he, she, it) "-s" li lêkerê zêde dibe:

- *He sees [sîz]: ew (mêr) dibîne*
- *She sees: ew (jin) dibîne*
- *It sees: ew (heywan, amûr) dibîne*

Heke forma sade ya lêkerê bi "-o, -s, -ch, -sh, -x" bi dawî bê, hingê li gel "he, she, it" paşpirtika "-es" li lêkerê zêde dibe:

- *I go (ez diçim) # he/she/it goes (ew diçe)*
- *You watch (tu temaşe dikî) # he/she/it watches (ew temaşe dike)*
- *We mix (em têkil/tevlihev dikin) # he/she/it mixes (ew têkil dike)*

Heke lêker bi konsonantekê + "y" bi dawî bê, hingê "y" dikeve û "-ies" cihê wê digire:

- *I cry [kray] (ez digirîm) # he/she cries [crayz] (ew digirî).*

Lê heke peyv bi vokalekê + "y" biqede, hingê "y" naguhere, tenê "s" lê zêde dibe:

- *You buy [bay] (tu dikirî) # he/she buys [bayz] (ew dikirre).*

Bi gotineka din, qeyd û bendên wergirtina "s" yan "es" û guherînên di rehê peyvê de çêdibin wek yên zêdebûna "s" yan "es" yên pirhejmariya navdêran in.

LÊKERÊN GIRING

Em ê li vê derê hin ji giringtirîn lêkerên inglîzî li gel awayê gotina wan û maneya wan pêşkêş bikin. Bo lêkerên "be" (bûn), "have" (hebûn, xwedî bûn), û "do" (kirin) li jêrtir binêrin.

Herwiha lêkerên alîkar (can, may...) li jêrtir hatine behskirin.

Hin ji van peyvên ne tenê lêker in lê di eynî demê de navdêr yan rengêr in jî, bo nimûne: "rain: baran; barîn", "clean: paqij kirin; paqij". Lê li vê derê tenê maneya lêkerê hatiye dan. Herwiha tenê maneyên serekî di vê lîsteyê de hatine diyarkirin.

Nivîsîn	Gotin	Wate
act	[ekt]	xebitîn, kar kirin, bersiv dan
agree	[egrî]	li hev kirin, pêk kirin, hevbîr bûn, sulh kirin
answer	[ensir]	bersiv dan, cewab dan
appear	[epîr]	diyar bûn, berçav bûn, xuya bûn
arrive	[erayv]	hatin, gihiştin
ask	[esk]	pirsîn, pirs kirin
attack	[etek]	êriş kirin, hicûm kirin
bake	[beyk]	pehtin, patin
begin	[bigin]	dest pê kirin
believe	[biîv]	bawer kirin
boil	[boyî]	kelîn; kelandin
bite	[bayt]	gezandin, gestin, leq lê dan
borrow	[borow]	deyn kirin, bi emanet jê wergirtin
break	[brîk]	şkandin; şkestin
bring	[bring]	anîn, înan
build	[biîd]	ava kirin
burn	[birn]	sotin, şewitîn; sotin, şewitandin

buy	[bay]	kirrîn
call	[koɫ]	gazî kirin; telefon kirin
care	[kêr]	xem jê xwarin
change	[çeync]	guherrîn; guherrandin
choose	[çûz]	bijartin
clean	[klîn]	paqij kirin
climb	[kɫaym]	hilketin, hilkişîn, hewa ketin
close	[kɫowz]	girtin, qepat kirin
collect	[kuɫekt]	kom kirin, civandin, berhev kirin
compare	[kumpêr]	dan ber hev, berhev dan, miqayese kirin
cry	[kray]	girîn; qîrrîn
continue	[kuntinyû]	domîn, berdewam bûn; domandin, dewam kirin
cut	[kât]	birrîn; qut kirin
dare	[dêr]	wêrîn, wêriyan
decide	[disayd]	biryar dan, qerar dan
die	[day]	mirin
drink	[drink]	vexwarin
eat	[ît]	xwarin
fall	[foɫ]	ketin
fly	[flay]	firrîn
feel	[fiɫ]	pê hesîn, hest pê kirin
fire	[fayr]	agir berdan
fly	[flay]	firrîn
forget	[forgêt]	ji bîr kirin, ji bîrê çûn
frighten	[fraytin]	tirsandin
get	[gêt]	wergirtin, bi dest xistin, peyda kirin
go	[gow]	çûn
hear	[hîr]	bihîstin, guh lê bûn
hold	[hoɫd]	girtin, zeft kirin
hope	[howp]	hêvî kirin
keep	[kîp]	girtin, ragirtin, parastin
know	[now / niw]	zanîn; nasîn, nas kirin
laugh	[ɫaf]	kenîn
lead	[lîd]	serkêşî kirin, serkêş bûn; birin, gihandin
learn	[lirn]	hîn bûn, fêr bûn, elimîn
leave	[ɫiv]	çûn, bi rê ketin; hiştin, hêlan

lay	[ley]	dirêj kirin, pal dan
let	[lêt]	rê dan, destûr dan, ruxset dan, hiştin, hêlan
lie (speak untruly)	[ɫay]	derew kirin
lie (be laid)	[ɫay]	pal dan, xwe dirêj kirin, dirêjkirî bûn
listen	[lisin]	guhdarî kirin, guh danê
live	[ɫiv]	jîn
love	[ɫav]	jê hez kirin, evîndar bûn
make	[meyk]	çêkirin, kirin
move	[mûv]	livîn; livandin; bar kirin
open	[owpin]	vebûn; vekirin
paint	[peynt]	boyax kirin; nîgar kirin
play	[pley]	lîstin, yarî kirin; (muzîk) lê dan, (muzîk) berdanê
please	[pɫîz]	kêfxweş kirin, dilxweş kirin; bi dilî bûn
put	[put]	danîn, bi cih kirin
rain	[reyn]	baran barîn
read	[rîd]	xwandin, xwendin
say	[sey]	gotin
see	[sî]	dîtin
seem	[sîm]	(wisa) diyar bûn, (wer) xuya bûn
sell	[sêt]	firotin
send	[sënd]	şandin, hinartin, bi rê kirin
set	[sêt]	danîn, bi cih kirin
settle	[sêtɫ]	bi cih bûn, mal danîn
shake	[şeyk]	hejîn, lerizîn; hejandin, lerizandin
show	[şow]	nîşan dan; pêşkêş kirin
sing	[sing]	stran gotin, strîn
sit	[sit]	rûniştin
stand	[stend]	rawestîn, sekinîn
start	[start]	dest pê kirin, start kirin
swim	[swim]	avjenî kirin, sobarî kirin, melevanî kirin
take	[teyk]	rakirin, birin; bijartin; xwarin yan vexwarin
teach	[tiç]	hîn kirin, fêr kirin, elimandin
think	[θink]	fikirîn, hizirîn, pûnijîn, ramîn, fikir kirin,

		hizir kirin
wake	[weyk]	hişyar bûn; hişyar kirin
walk	[wołk]	meşîn, gerrîn, bi rê ve çûn, bi piyan gerrîn
want	[wont]	hez kirin, xwastin, xwestin
wash	[woş]	şûştin
write	[rayt]	nivîsîn
work	[wurk]	kar kirin, xebitîn

Bala xwe bidinê ku

- Hemû ev peyv dikarin bêyî ti guherandinan li gel cînavên "I, you, we, you, they" bi merema dema niha bên bikaranîn:
"I laugh" (ez dikenim), "you say" (tu dibêjî), "we read" (em dixwînin), "you eat" (hûn dixwin), "they hope" (ew hêvî dikin).
- Li gel cînavên "he, she, it" jî em tenê hewceyî zêdekirina "-s" yan "-es" li dawiya lêkerê ne:
"He laughs" (ew dikene), "she says" (ew dibêje), "it eats" (ew dixwe).
- Eynî peyv dikare di heman demê de gerguhêz (transitive) û negerguhêz (intransitive) be: "change: guherîn; guherandin", "break: şkestin; şkandin".
- Gelek peyv hem wek rengdêr (adjective) û wek lêker (verb) jî dikarin bên bikaranîn:
"clean: paqij; paqij kirin", "hope: hêvî; hêvî kirin"
- Gelek navdêr jî wek lêker tên bikaranîn:
"fire: agir; agir berdan", "rain: baran; baran barîn"
- Hin peyv jî wek hev tên nivîsîn lê xwandina wan li gor maneya wan diguhere:
"live [live]: jîn" lê "live [layv]: zindî".

Lêkera "to be" [tu bî] (bûn)

Wek di kurdî û gelek zimanên din de jî, lêkera "to be" (bûn) di inglîzî de jî bi awayekê awarte/istisna tê çemandin / tewandin:

Inglîzî	Kurdî
I am ... [ay em ...]	ez ... im
You are ... [yû ar ...]	tu ... î
He / she / it is ... [hî / şî / it iz ...]	ew ... e
We are ... [wî ar ...]	em ... in
You are ... [yû ar ...]	hûn ... in
They are ... [ðey ar ...]	ew ... in
I am not ... [nät]	ez ne ... im
You are not ...	tu ne ... î
He/she/it is not ...	ew ne ... e
We are not ...	Em ne ... in
You are not ...	hûn ne ... in
They are not ...	Ew ne ... in

Nimûne

- *I am Gulîzar. (Ez Gulîzar im.)*
- *You are a doctor. [däktir] (Tu doktor î.)*
- *He is a physician. [fizişin] (Ew bijîşk e.)*
- *She is Vanessa. (Ew Vanessa ye.)*
- *It is a dog. (Ew se ye.)*
- *We are friends. (Em heval in.)*
- *You are kind. (Hûn xweşmirov in.)*
- *They are here. (Ew li vê derê ne.)*
- *I am not a teacher. [tîçir] (Ez ne hînker im / ne mamosta me.)*
- *You are not there. [ðêr] (Tu ne li wê derê yî.)*
- *He is not at home. [howm] (Ew ne li malê ye.)*
- *She is not sick. [sik] (Ew ne nesax e / ne nexweş e.)*
- *It is not a cat. (Ew ne kitik/pisîk e.)*
- *We are not present. [prêzint] (Em [li derekê] ne amade ne.)*
- *You are not ready. (Hûn ne hazir in.)*

- *They are not bad. (Ew ne xirab in.)*

Bala xwe bidinê ku

- Forma dema niha li gel cînavên "you, we, they" wek hev e (erênî: "are", neyînî: "are not")
- Di inglîzî de lêker dikeve dû kirdeyê (I am Gulîzar) lê di kurdî de lêker li dawiya hevokê ye (ez Gulîzar im).
- Di inglîzî de "not" ya neyînîkirinê dikeve pey lêkerê (I am not Gulîzar) lê di kurmancî de ("ne") yekser li peyv kirdeyê tê (Ez ne Gulîzar im).
- Di inglîzî de, bi taybetî di axiftinê de lê gelek caran di nivîsînê de jî, formên lêkera "bûn"ê tên kurtkirin û bi cînavî ve tên girêdan:

Standard	Kurtkirî
I am ...	I'm ... [aym ...]
You are	you're ... [yor ...]
He is, she is, it is ...	he's ... [hiz], she's ... [şiz], it's ... [its] ...
We are ...	we're [wir] ...
You are ...	you're ... [yor]
They are ...	you're ... [ðeyr]
I am not	I'm not
You are not	You're not, you aren't
he/she/it is not	he's not, she's not, it's not
We are not	we're not, we aren't
You are not	You're not, you aren't

Lêkera "to do" [tu du] (kirin)

Inglîzî	Kurdî
I do [dû] ...	ez ... dikim
You do [dû] ...	tu ... dikî
He/she/it does [dâz] ...	ew ... dike
We do [dû] ...	em ...

	dikin
You do [dû] ...	hûn ... dikin
They do [dû] ...	ew ... dikin
I don't ... [dont]	ez ... nakim
You don't ... [dont]	tu ... nakî
he/she/it doesn't ... [dazint]	ew ... nake
We don't ... [dont]	em ... nakin
You don't ... [dont]	hûn ... nakin

Çawa ku lêkera "kirin" di kurmancî de yek ji giringtirîn peyvan e – heke ne ya giringtirîn be – wisa "do" ya inglîzî jî cihekê bingehîn di wî zimanî de heye. Kirin hem wek lêkerekê xweser û hem jî wek lêkerekê alîkar dixebite:

- I do this. (Ez vê dikim.)
- You do your job well. (Tu karê xwe baş dikî.)
- He does that. (Ew wê dike.)
- I don't do that. (Ez wê nakim.)
- He doesn't. (Ew nake.)

WEZÎFEYÊN LÊKERA "DO, DON'T"

Lêkera "do" û formên wê yên tewandî "does, don't, doesn't" wek lêkera alîkar (*auxiliary verb*) li gel lêkera serekî (main verb) tê bikaranîn:

a) di hevokên pirsyarkî (question) de:

- o *You go. (Tu diçî.) → Do you go? (Gelo tu diçî?)*
- o *He comes. (Ew tê.) → Does he come? (Gelo ew tê?)*

- Lê hişyar be ku "do" li gel cînavên "he, she, it" dibe "does".
- Herwiha lê miqate be ku peyvrêza hevokê diguhere: lêkera alîkar tê berî cînavî.
- Tenê lêkera alîkar "do" ditewe, lêkera serekî wek xwe dimîne. "Does he come", ne "does he comes".

b) bo çêkirina hevokên neyînî (negative)

- *We say. (Em dibêjin.) → We don't say? (Em nabêjin.)*
- *He comes. (Ew tê.) → He doesn't come? (Ew nayê?)*

- Lê hişyar be ku bi forma xwe ya neyînî li gel cînavên "I, you, we, you, they" "don't" (do not) e û bi cînavên "he, she, it" re jî "doesn't" (does not) e.
- Berevajî hevokên pirsyarkî, di hevokên neyînî de lêkera alîkar nayê berî cînavî lê li dûv cînavî cihê xwe digire.
- Tenê lêkera alîkar ditewe, lêkera serekî herdem wek xwe dimîne.

Lêkerên alîkar yên raweyî

Bi xêra lêkerên alîkar yên raweyî (*modal auxiliary verbs*) mirov diyar dike ku tiştek dibe ku, dikare yan divê bê ku kirin. Çend lêkerên alîkar yên raweyî yên inglîzî ev in:

Nivîsîn	Gotin	Wate
can	[ken]	karîn, kanîn, şîyan
may	[mey]	dibe ku, belkî, mimkin e ku
must	[mäst]	divê ku, pêdivî ye ku, pêwîst e ku
shall	[şet]	biryar e ku, divê ku
will	[wił]	dê (diyarkirina dema bê)

Hişyarî

Ev lêker li gel cînavên "he, she, it" jî natewin, di dema niha de herdem wek xwe dimînin. Lêkera serekî jî netewandî ye.

Nimûne

- *I can open this. (Ez dikarim vê vekim. Ez dişêm vê vekim.)*
- *He can say. (Ew dikare bibêje.)*
- *We may buy it. (Dibe ku em wê bikirrin.)*
- *She may see me tomorrow. (Dibe ku ew sibê min bibîne.)*
- *You must do your job. (Divê tu karê xwe bikî.)*
- *He must come here. (Divê ew bê vê derê.)*

- *I shall travel tomorrow. (Biryar e ku bi rê bikevim.)*
- *He shall visit us next week. (Biryar e ku ew hefteya bê serdana me bike.)*
- *I will go there. (Ez ê biçim wê derê.)*
- *She will sell her house. (Ew dê xaniyê xwe bifiroşe.)*

Neyîniya lêkerên alîkar yên raweyî

Nivîsîn	Gotin	Wate
can't, cannot	[kent, kennot]	nikarîn, nikanîn, neşyan
may not	[mey]	dibe ku ne-, belkî ne-,
must	[mäst not]	nabe ku, divê ku ne-
will not, won't	[wił not, wont]	dê ... ne-

Nimûne

- *I can't open this. (Ez nikarim vekim. Ez neşêm vê vekim.)*
- *He can't say. (Ew nikare bibêje.)*
- *We may not buy it. (Dibe ku em wê nekirrin.)*
- *She may not see me tomorrow. (Dibe ku ew sibê min nebîne.)*
- *You must not do your job. (Nabe ku tu karê xwe bikî.)*
- *He must not come here. (Nabe ku ew bê vê derê.)*
- *I will not go there. (Ez ê neçim wê derê.)*
- *She will not sell her house. (Ew dê xaniyê xwe nefiroşe.)*

Lêkera "to have" [tu hev] (hebûn, xwedî bûn)

Herwiha lêkera "to have" (hebûn, xwedî bûn) jî awarte tê çemandin:

Inglîzî	Kurdî
I have ... [ay hev ...]	min ... heye
You have ... [yû have ...]	te ... heye
He / she / it has ... [hî / şî / it hez ...]	wê / wî ... heye
We have ... [wî hev ...]	me ... heye
You have ... [yû hev ...]	we ... heye
They have ... [dêy ar ...]	wan ... heye

I don't have ... [don't hev]	min ... nîne
You don't have ...	te ... nîne
He/she/it is doesn't have ... [dazint]	wê/wî ... nîne
We don't have ...	me ... nîne
You don't have ...	we ... nîne
They don't have ...	wan ... nîne

Nimûne

- I have a friend. (Min hevalek heye. Hevalemê min heye.)
- I have many friends. (Min gelek heval hene. Gelek hevalên min hene.)
- You have a blue car. [blû kar] (Te tirimpêleka şîn heye.)
- He has a brother. [brâdîr] (Wî birayek heye.)
- He has four sisters. (Wî çar xwişk hene.)
- We have a very nice secretary. (Me sekretereka gelek hêja heye.)
- I don't have a car. (Min ti tirimpêl nînin. /Tirimpêla min tine ye.)
- You don't have cigarettes. [sigârêts] (Te cigare nînin.)
- He doesn't have a child. [çayîd] (Wî ti zarok nînin.)
- She doesn't has two dogs and three cats. (Wê du se û sê kitik/pisîk hene.)
- They have only one boss. [onî wân bos]. (Wan tenê serkarek/şefek heye.)

Bala xwe bidinê ku:

- a) Cînavên "he, she, it" forma "has" [hez] werdigirin. Wek din, "have" [hev] forma hevpar ya hemû cînavên din e.
- b) Di inglîzî de forma lêkerê li gor kirdeyê diguhere ("*I have a book / many books*" lê "*she has a book / many book*"). Lê di kurmancî de lêkera "hebûn"ê li gor tiştê heyî diguhere: "*Min kitêbek heye*" û "*wê kitêbek heye*" lê "*min gelek kitêb hene*" û "*wê gelek kitêb hene*".
- c) Di kurdî de li cihê "*min kitêbek heye / gelek kitêb hene*" di hin devokan de ev awa li kar e: "*Kitêbeke min heye / gelek kitêbên min hene*."
- d) Forma neyînî (*negative*) bi lêkera alîkar "don't" [dont] tê çêkirin. Ew li gel cînavên "he, she, it" forma "doesn't" digire, bi cînavên din re "don't" e. Formên wê ya resmî "do not" (don't) û "does not" (doesn't) in.

Dema borî ya sade

Dema borî ya sade (simple past) ya piraniya peyvên bi paşpirtika "-ed" tê çêkirin:

- I want (ez dixwazim) → I wanted (min xwast)
- You show (tu nîşan didî) → you showed (te nîşan da)
- We play football (em futbolê dilîzin) → we played football (me futbol lîst)

Bala xwe bidinê ku

- 1) Li gel kesê sêyem jî forma lêkerê wek hemû bi hemû cînavên din re ye:
 - o *He/she plays piano (ew piyanoyê lê dide) → He/she played piano (Wî/wê li piyanoyê da)*
- 2) Heke lêker bi xwe bi "e" bi dawî bê, hingê tenê "d" lê tê zêdekirin:
 - o *They hire a car (Ew tirimpêlekê kirê dikin) → they hired a car (wan tirimpêlek kirê kir)*
- 3) Neyînîkirina lêkerên dema borî bi alîkariya "did not" (kurtkirî "didn't") tê çêkirin. Hingê lêkera serekî di forma xwe ya sade de ye, ne forma bi "-ed". Ew forma dema borî ya "do not" ya dema niha ye. Lê bi kesê sêyem re jî ew eynî "do not / don't" e, wek dema niha naguhere:
 - o *You walked (tu meşiyayî) → you didn't walk (tu ne meşiyayî)*
 - o *She smiled (ew bişirî) → she didn't smile (ew nebişirî)*
- 4) Pirskirina erênî bi alîkariya "did" li destpêka hevokê tê çêkirin:
 - o *You played (te lîst) → Did you play? (Gelo te lîst?)*
- 5) Pirskirina neyînî bi alîkariya "did not / didn't" li destpêka hevokê tê çêkirin:
 - o *She didn't smile (Ew nebişirî) → Didn't she smile? (Gelo/ma ew nebişirî?)*
- 6) Piraniya peyvên sade formên awarte/istisna bo demên borî hene. Li jêrtir binêre.

Dema borî ya lêkera "to be" (bûn)

Inglîzî	Kurdî
I was ... [ay wîz ...]	ez ... bûm
You were ... [yû wër ...]	tu ... bûyî
He / she / it was ... [hî / şî / it wîz ...]	ew ... bû
We were ... [wî wër ...]	em ... bûn
You were ... [yû wër ...]	hûn ... bûn
They were ... [ðey wër ...]	ew ... bûn
I was not / wasn't ... [wozint]	ez ne ...

	bûm
You were not / weren't [wêrint] ...	tu ne ... bûyî
He/she/it was not / wasn't ...	ew ne ... bû
We were not / weren't ...	Em ne ... bûn
You were not / weren't ...	hûn ne ... bûn
They were not / weren't ...	Ew ne ... bûn

Lêkera "to have" (hebûn)

- bi hemû cînavan re di dema borî ya sade de bi erênî "had" [hed] e:
 - o I had a cat. (Min pişîkek hebû)
 - o He had friends there. (Wî heval li wê derê hebûn)
- forma wê ya neyînî "did not have / didn't have" e:
 - o I didn't have a dog. (Min ti se/kûçik tine bûn)
 - o She didn't have any children. (Wê ti zarok tine bûn)

Lêker > dema borî ya sade	Gotin	Wate
begin > began	[bigin > bigen]	dest pê kirin
break > broke	[brîk > browk]	şkandin; şkestin
bring > brought	[bring > brawt]	anîn, înan
build > built	[biłd > biłt]	ava kirin
buy > bought	[bay > bawt]	kirrîn
choose > chose	[çûz > çoyz]	bijartin
cry > cried	[kray > cried]	girîn; qîrrîn
cut > cut	[kât > kât]	birrîn; qut kirin
do > did	[du > did]	kirin
drink > drank	[drink > drenk]	vexwarin
eat > ate	[ît > eyt]	xwarin
fall > fell	[foł > fêł]	ketin
feel > felt	[fił > fêł]	pê hesîn, hest pê kirin
fly > flew	[flay > flîw]	firrîn
forget > forgot	[forgêt > forgot]	ji bîr kirin, ji bîrê çûn
get > got	[gêt > got]	wergirtin, bi dest xistin, peyda kirin
go > went	[gow > wênt]	çûn
hear > heard	[hîr > hird]	bihîstin, guh lê bûn
hold > held	[hołd > hêłd]	girtin, zêft kirin
keep > kept	[kîp > kêpt]	girtin, ragirtin, parastin
know > knew	[now / niw > nîw]	zanîn; nasîn, nas kirin
lead > led	[lîd > led]	serkêşî kirin, serkêş bûn; birin, gihandin
leave > left	[lîv > lêft]	çûn, bi rê ketin; hiştin, hêlan
lay > laid	[ley > leyd]	dirêj kirin, pal dan
let > let	[lêt > lêt]	rê dan, destûr dan, ruxset dan, hiştin, hêlan
make > made	[meyk > meyd]	çêkirin, kirin
put > put	[put > put]	danîn, bi cih kirin
read > read	[rîd > rêd]	xwandin, xwendin

say > said	[sey > sêd]	gotin
see > saw	[sî > sow]	dîtin
sell > sold	[sêł > sołd]	firotin
send > sent	[send > sênt]	şandin, hinartin, bi rê kirin
set > set	[sêt > sêt]	danîn, bi cih kirin
sing > sang	[sing > seng]	stran gotin, strîn
sit > sat	[sit > set]	rûniştin
stand > stood	[stend > stûd]	rawestîn, sekinîn
take > took	[teyk > tuk]	rakirin, birin; bijartin; xwarin yan vexwarin
teach > taught	[tîç > tot]	hîn kirin, fêr kirin, elimandin
think > thought	[θink > θot]	fikirîn, hizirîn, pûnijîn, ramîn, fikir kirin, hizir kirin
wake > woke	[weyk > wok]	hişyar bûn; hişyar kirin
write > wrote	[rayt > rowt]	nivîsîn

Dema borî ya dûdar

Dema borî ya dûdar (*present perfect*) bi alîkariya lêkera "to have" ya di dema niha de + lêker di dema borî ya dûdar de tê çêkirin. Piraniya peyvên bi paşpirtika "-ed" tê çêkirin:

- I worked (ez kar kir) → I have worked (min kar kiriye)
- You played piano (te piyano lê da) → you have played piano (te piyano lê daye)
- We played football (me futbol lîst) → we have played football (me futbol lîstiyê)

Bala xwe bidinê ku

- 1) Li gel kesê sêyem forma lêkerê "has" [hez] e:
 - o *He/she played piano (ew piyano lê da) → He/she has played piano (Wî/wê li piyanoyê daye)*
- 2) Tenê lêkera alîkar "have" li gor cînavî û/yan neyînîkirinê diçeme, lêkera serekî wek xwe dimîne.
 - o Neyînîkirina lêkerên dema borî bi alîkariya "have not / has not" (kurtkirî "haven't / hasn't") tê çêkirin. Hingê lêkera serekî di forma xwe ya bi "-ed" e.
 - o *You have worked (te kar kiriye) → you haven't worked (te kar nekiriye)*
 - o *She has smiled (ew bişiriye) → she hasn't smiled (ew nebişiriye)*
- 3) Pirskirina erênî bi alîkariya "have / has" li destpêka hevokê tê çêkirin:
 - o *You have played (te lîstiyê) → Have you played? (Gelo te lîstiyê?)*
- 4) Pirskirina neyînî bi alîkariya "have not / has not" (kurtkirî haven't / hasn't) li destpêka hevokê tê çêkirin:
 - o *She hasn't smiled (Ew nebişiriye) → Hasn't she smiled? (Gelo/ma ew nebişiriye?)*
- 5) Piraniya peyvên sade formên awarte/istisna bo dema borî ya dûdar hene. Hin ji wan wek yên dema borî ya sade ne lê hin jî cuda ne. Li jêrtir binêre.

Dema borî ya dûdar ya lêkera "to be" (bûn)

Inglîzî	Kurdî
I have been ... [ay hev been ...]	ez ... bûme
You have been ... [yû hev bîn ...]	tu ... bûyî
He / she / it has been... [hî / şî / it hez bîn...]	ew ... bûye
We have been ... [wî hev bîn ...]	em ... bûne
You have been ... [yû hev bîn ...]	hûn ... bûne
They have ... [dey hev bîn ...]	ew ...

	bûne
I have not been / I haven't been ... [ay hevint bîn]	ez ne ... bûme
You have not been / haven't [hevint bîn] ...	tu ne ... bûyî
He/she/it has not been / hasn't been...	ew ne ... bûye
We have not been/ haven't been...	Em ne ... bûne
You have not been / haven't been...	hûn ne ... bûne
They have not been / haven't been...	Ew ne ... bûne

Lêkera "to have" (hebûn) di dema borî ya dûdar de

- bi cînavên sêyem (he, she, it) re "has had" e, bi neyînî "has not had / hasn't had"
- li gel cînavên din "have had" e, bi neyînî "have not had / haven't had"
- pirskirin bi bicihkirina "have / has" yan "haven't / hasn't" li pêş cînavan tê çêkirin:
 - o Have you had a car? (Gelo te tirimpêlek hebûye)
 - o Has he had a cat? (Gelo wî kitikek hebûye?)
 - o Haven't you had holiday? (Gelo/ma we tatîl nebûye?)
 - o Hasn't she had a baby? (Gelo / ma wê zarokek nebûye?)

Lêker > dema borî ya dûdar	Gotin	Wate
begin > begun	[bigin > bigan]	dest pê kirin
break > broken	[brîk > browkin]	şkandin; şkestin
bring > brought	[bring > brawt]	anîn, înan
build > built	[biîd > biît]	ava kirin
buy > bought	[bay > bawt]	kirrîn
choose > chosen	[çûz > çoyzin]	bijartin
cry > cried	[kray > cried]	girîn; qîrrîn
cut > cut	[kât > kât]	birrîn; qut kirin
do > done	[dû > dan]	kirin
drink > drunk	[drink > dränk]	vexwarin
eat > eaten	[ît > îtin]	xwarin
fall > fell	[foł > fêł]	ketin
feel > felt	[fił > fêł]	pê hesîn, hest pê kirin
fly > flown	[flay > flown]	firrîn
forget > forgot / forgotten	[forgêt > forgot / forgotin]	ji bîr kirin, ji bîrê çûn
get > got	[gêt > got]	wergirtin, bi dest xistin, peyda kirin
go > gone	[gow > gan]	çûn
hear > heard	[hîr > hird]	bihîstin, guh lê bûn
hold > held	[hołd > hêłd]	girtin, zêft kirin
keep > kept	[kîp > këpt]	girtin, ragirtin, parastin
know > known	[now / niw > nîw]	zanîn; nasîn, nas kirin
lead > led	[lîd > led]	serkêşî kirin, serkêş bûn; birin, gihandin
leave > left	[lîv > lêft]	çûn, bi rê ketin; hiştin, hêlan
let > let	[lêt > lêt]	rê dan, destûr dan, ruxset dan, hiştin, hêlan

make > made	[meyk > meyd]	çêkirin, kirin
put > put	[put > put]	danîn, bi cih kirin
read > read	[rîd > rêd]	xwandin, xwendin
say > said	[sey > sêd]	gotin
see > seen	[sî > sîn]	dîtin
sell > sold	[sêl > sołd]	firotin
send > sent	[send > sênt]	şandin, hinartin, bi rê kirin
set > set	[sêt > sêt]	danîn, bi cih kirin
sing > sung	[sing > sâng]	stran gotin, strîn
sit > sitten	[sit > sitin]	rûniştin
stand > stood	[stend > stûd]	rawestîn, sekinîn
take > taken	[teyk > teykin]	rakirin, birin; bijartin; xwarin yan vexwarin
teach > taught	[tiç > tot]	hîn kirin, fêr kirin, elimandin
think > thought	[θink > θot]	fikirîn, hizirîn, pûnijîn, ramîn, fikir kirin, hizir kirin
wake > woken / waked	[weyk > wokin / wekid]	hişyar bûn; hişyar kirin
write > written	[rayt > ritin]	nivîsîn

Forma borî ya dûdar di heman demê de wek rengdêr jî tê bikaranîn:

- sold: firotî
- done: kirî
- written: nivîsandî, nivîsiyayî

Dema borî ya dûr

Dema borî ya dûr (past perfect) jî wek dema borî ya dûdar e lê li cihê "have, has" lêker "had" e:

- *I had done it. (Min ew kiribû.)*
- *She had eaten lunch. (Wê firavîn xwaribû.)*
- *You hadn't said anything. (Te ti tişt negotibû.)*
- *He hadn't come. (Ew nehatibû.)*

Dema niha ya berdest

Dema niha ya berdest yan berdewam (present continuous, present progressive) tê maneya ku kesek aniha tiştêkî dike. Di inglîzî de ew bi lêkera "to be" (bûn) di dema niha de + lêkera serekî bi forma xwe ya neçemandî + paşpirtika "-ing" bi lêkera serekî ve tên çêkirin:

- *I am eating breakfast. (Ez ê taştê dixwim.)*
- *You are drinking water. (Tu ê avê vedixwî.)*
- *He is singing. (Ew ê stranan dibêje.)*
- *She is waiting for us. (Ew li benda me ye.)*
- *We are studying history. (Em ê dîrokê dixwînin.)*
- *You are finishing your job. (Hûn ê karê xwe temam dikin.)*
- *They are sleeping. (Ew nivistî ne. Ew razayî ne. Ew di xewê de ne.)*

Neyînîkirin jî bi forma neyînî ya "to be" ya di dema niha de ye:

- *I am not drinking wine. (Ez aniha meyê venaxwim.)*
- *She isn't studying geography. (Ew aniha cografyayê naxwîne.)*

Pirskirin bi bicihkirina lêkera "to be" di dema niha de li pêş cînavan e:

- *Are you eating dinner? (Gelo/ma tu aniha şîvê dixwî? Gelo/ma tu li ser şîvê yî?)*
- *Isn't he waiting for you? (Gelo/ma ew li benda we namîne. Gelo ew li hêviya we nasekine?)*

Dema borî ya berdest

Dema borî ya berdest yan berdewam (past continuous, past progressive) tê maneya ku kesekî di demeka diyar ya borî de tiştêkî dikir. Di inglîzî de ew bi lêkera "to be" (bûn) di dema borî ya sade de + lêkera serekî bi forma xwe ya neçemandî + paşpirtika "-ing" bi lêkera serekî ve tên çêkirin:

- *I was eating breakfast. (Ez taşt dixwar.)*
- *You were drinking water. (Tu av vedixwar.)*
- *He was singing. (Wî stran digotin.)*
- *She was waiting for us. (Ew li benda me bû.)*
- *We were studying history. (Me dîrok dixwand.)*
- *You were finishing your job. (We karê xwe tamam dikir.)*
- *They were sleeping. (Ew nivistî bûn. Ew razayî bûn. Ew di xewê de bûn.)*

Neyînîkirin jî bi forma neyînî ya "to be" ya di dema borî ya sade de ye:

- *I was not drinking wine. (Min hingê mey venedixwar.)*
- *She wasn't studying geography. (Wê hingê cografya nedixwand.)*

Pirskirin bi bicihkirina lêkera "to be" di dema borî ya sade de li pêş cînavan e:

- *Were you eating dinner? (Gelo/ma te hingê şîv dixwar? Gelo/ma tu li ser şîvê bûyî?)*
- *Wasn't he waiting for you? (Gelo/ma ew li benda we nedima? Gelo/ma ew li hêviya we nedisekinî?)*

Dema bêt ya berdest

Dema bêt ya berdest yan berdewam (future continuous, future progressive) tê maneya ku kesekî dê di demeka diyar ya bêt debi kirina tiştêkî mijûl be. Di inglîzî de ew bi lêkera "will be" + lêkera serekî bi forma xwe ya neçemandî + paşpirtika "-ing" bi lêkera serekî ve tîn çêkirin:

- *I will be eating breakfast. (Ez dê bi xwarina taştê ve mijûl bim.)*
- *You will be working. (Tu dê bi karkirinê ve mijûl bî.)*
- *He will be singing. (Ew dê bi strangotinê ve mijûl be.)*
- *She will be waiting for us. (Ew dê li benda me be. Çavê wê dê li rêya me be.)*
- *We will be studying history. (Em dê bi xwandina dîrokê ve mijûl bin.)*
- *You will be finishing your job. (Hûn dê bi tamamkirina karê xwe ve mijûl bin.)*
- *They will be sleeping. (Ew dê nivistî bin. Ew dê razayî bin. Ew dê di xewê de bin.)*

Neyînîkirin jî bi forma "will not be" (kurtkirî "won't be") tê çêkirin:

- *I will not be drinking wine. (Ez ê ne bi vexwarina meyê ve mijûl bim. Yan: Ez ê bi vexwarina meyê ve mijûl nebim.)*
- *She won't be studying geography. (Ew dê ne bi xwandina cografyayê ve mijûl be. Yan: Ew dê bi xwandina cografyayê ve mijûl nebe.)*

Pirskirin bi bicihkirina lêkera "to be" di dema borî ya sade de li pêş cînavan e:

- *Will you be eating dinner? (Gelo/ma tu dê bi xwarina şîvê ve mijûl bî? Gelo/ma tu dê li ser şîvê bî?)*
- *Won't he be waiting for you? (Gelo/ma ew dê li benda we nemîne? Gelo/ma ew dê ne li hêviya we be?)*

PASÎV

Pasîv (tebatî) di inglîzî de bi alîkariya lêkera "to be" (li gor dem û kesan çemandî) + lêker a serekî di dema borî ya dûdar de tê çêkirin:

- Dema niha û dema borî ya dûdar:
 - o is made = tê çêkirin; hatiye çêkirin
 - o was made = (di)hat çêkirin; hatibû çêkirin
- *He is seen there everyday: Ew her roj li tê dîtin / Ew her roj li wir hatiye dîtin.*
- *He was seen there everyday: Ew her roj li wir dihat dîtin / Ew her roj li wir hatibû dîtin.*

Bikerê anku ajanê hevokê bi alîkariya daçeka "by" (bi, ji aliyê ve) tê diyarkirin:

- *He was killed by gun. Ew bi tîfekê hat(ibû) kuştin.*
- *This play is written by Shakespeare. Ev şano ji aliyê Shakespeare ve hatiye nivîsîn.*

DEM

SAL

Inglîzî	Kurdî
year [yîr]	sal
this year	vê salê; ev sal
that year	wê salê; ew sal
next year	sala bê
last year	par, sala borî, sala çûyî
two years ago [igu]	pêrar, du sal berê
in three years	di sê salan de
in the year 2014	di sala 2014 de
decade [dêkeyd]	dehsal, dehe, heyama deh salan
century [sênçurî]	sedsal, sede, heyama sed salan
millennium [millenyum]	hezarsal, hezare, heyama hezar salan

DEMSAL

Inglîzî	Kurdî
season [sîzin]	demsal, werz, mewsim, fesi
winter [wintir]	zivistan
spring [spring]	bihar
summer [sâmir]	havîn
fall [foł] (li Amerîkayê)	payiz
autumn [otim] (li Brîtanayê)	payiz
in spring / summer / fall / winter	biharê /havînê / payizê / zivistanê
this winter	vê zivistanê; ev zivistan
next autumn	payiza bê
early spring	berbihar, destpêka bihar
two summers	du havînan

late autumn	payiza dereng
mid-winter	nîva zivistanê
before summer [bîfor]	berî havînê
after winter [eftir / aftir]	piştî zivistanê
mid-winter	nîva zivistanê

MEH

Inglîzî	Kurdî
month [mänθ]	meh, heyv, hîv
this month	vê mehê; ev meh
that month	wê mehê; ew meh
next month	meha bêt
last month	meha borî, meha çûyî
three months ago	sê meh berê
in four months	di çar mehan de

HEFTE

Inglîzî	Kurdî
week [wîk]	hefte, heftî
this week	vê hefteyê; ev hefte
next week	hefteya bêt
last week	hefteya borî
after a week	piştî hefteyekê
before three weeks	berî sê hefteyan
a week ago	berî hefteyekê
three weeks ago	berî sê hefteyan
weekdays	rojên karkirinê, rojên nav hefteyê, ji duşemê ta îniyê
weekend [wîkind]	dawiya hefteyê, şemî û yekşem

Monday [mändey, mändî]	duşem
Tuesday [tûzdey, tûzdî]	sêşem
Wednesday [wênzdey, wênzdi]	çarşem
Thursday [θirzdey, θirzdi]	pêncşem
Friday [fraydey, fraydi]	în, îni, heynî, cume
Saturday [setirdey, setirdî]	şemî
Sunday [sändey, sändî]	yekşem
on Monday / Tuesday / Wednesday....	duşemê /sêşemê / çarşemê...

ŞEV Û ROJ

Inglîzî	Kurdî
day [dey]	roj
night [najt]	şev
today [tudey]	îro
tomorrow [tumuro]	sibê, roja piştî îro
yesterday [yêstirdey]	duh, duhî
the day after tomorrow	dusibê
the day before yesterday	pêr
two days ago	pêr, berî du rojan
three days ago	betrapêr, berî sê rojan
day and night	bi şev û roj, bênavberr
24 hours	şev-û-rojek, bîst û çar saet
morning [morning]	spêde, sihar, sere sibê
noon [nûn]	nîvro
afternoon [eftirnûn /aftirnûn]	piştî nîvro
evening [îvning]	êvar
midnight [midnajt]	nîva şevê
sunrise [sânrayz]	rojrabûn, elind
sunset [sânsêt]	rojvabûn, hingur

in ten days	did eh rojan de
in the morning / evening / afternoon	spêdê / êvarê / piştî nîvro
sunset [sânsêt]	rojavabûn, hingur

SAET

Inglîzî	Kurdî
watch [woç]	saet, demjimêr (ya destan)
clock [klok]	saet, demjimêr (ya dîwaran)
hour [awir]	saet, 60 deqîqe
minute [minit]	deqîqe, deqe, xulek
second [sêkind]	sanî, saniye, çirke
half (an hour) [half en-awir]	nîv (saet), 30 deqîqe
quarter [kwartir]	çarêk(ek), 15 deqîqe
past [past]	"û", zêdetir ji ...
to [tu]	kêm, "jê re maye"
What time is it? [wat taym iz it?]	Saet çend e?
It is ... o'clock. [it iz ... oklok.]	Saet ... e. (saetên kamil)
It is one o'clock.	Saet yek e.
It is five o'clock.	Saet pênc e.
It is ten past three.	Saet sê û deh e.
It is a quarter past two.	Saet du û çarêkek e.
It is half past four.	Saet çar û nîv e.
It is ten to one.	Saet yek kêm deh e.
It is a quarter to six.	Saet şeş kêm çarêkek e.
It is seven sharp. [şarp]	Saet tam heft e.
It is ten a.m. [ey êm]	Saet dehî sibê ye.
It is eight p.m. [pî êm]	Saet heştî

	êvarê ye.
At nine a.m. [et nayn ey êm]	Nehî êvarê
At ten past five p.m.	Saet pênc û dehî êvarê.
At half past three p.m.	Saet sê û nîvî piştî nîvro.
Before four o'clock.	Berî saet çarê
After a quarter to three	Piştî sê kêr çarêkekê
Around two o'clock [irawnd]	Derdorên saet duyê
Four hours [for awirz]	çar saet(an)
Two hours fifteen minutes [tû awirz fiiftîn minits]	du saet û pazdeh deqîqe(yan)
One hour thirty minutes [wän awir θirtî minits]	saetek û sih deqîqe(yan)

XWARINÊN ROJÊ

Inglîzî	Kurdî
breakfast [brêkfist]	taşt, têşt, xwarinê spêdeyê
lunch [lanç]	firavîn, xwarina nîvro
dinner, supper [dinir, sapir]	şîv, xwarina êvarê
brunch [branç]	berfiravîn, tašta dereng yan firavîna zû branç